
R: 4
Rêketinnameya hevpar

R:5
Gola Urmiyê û pirsên siyasî yên têkildar



R:7
Kurd Li Sûriya



R: 8
Nûçegihanî, pîşeya herî metirsîdar di Îranî de



Bidestveanîna Mafên Netewî Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 189
21'ê Tebaxa 2012'an
Buha: 150 Tûmen

# Agirî


## Pîrozbahiya Sekreterê Giştî ê PDKÎ bi boneya cejna Remezanê

Bi boneya dawîhatina meha Remezanê û hatina cejna Remezana pîroz, pîrozbahiyê ji we musimanên kurd û bi taybetî li Kurdistana Îranê de dikim.
Bi hêviya ku rojî û nimêj û îbadetên vê mehê yên we li bal Yezdanê mezin bên qebûlkirin.
**PDKÎ, Sekreterê Giştî, Mistefa Hicrî**
**15'ê Tebaxa 2012'an**

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

**Hesen Şerefî:**

# Rêberiya bikom, afirandina PDKÎ bû



Di 67'mîn salvegera avakirina PDK Îranê de, endam û alîgirên partiyê di cihên cuda cuda ên cîhanê de, bîranîna vê rojê bilind ragirtin. Her bi vê boneyê ve, roja çarşemî, 25'ê Gelawêja 1391'an, di binkeya Deftera Siyasî ya PDKÎ de, rê û resmek bi beşdariya birêz Mustefa Hicrî Sekreterê Giştî yê partiyê, Mesûd Tek sekreterê Giştî yê Partiya Sosyalîst a Kurdistana Turkiyê, û endamên rêberî, û kadr û pêşmergên partiyê birêve çû.

Di rê û resma han de birêz Hesen Şerefî Cihgirê Sekreterê Giştî yê PDKÎ bi nûneratiya Deftera Siyasî ji beşdaran re axifî.
Rêzdar Şerefî di gotinên xwe de, tevî îşarekirina bi taybetmendiyên PDK Îranê, avabûna partiyê weke hewcehiyek dîrokî û rêxweşkerê avabûna Komara Kurdistanê da zanîn, û ragehand ku avakirina partiyek modern, demokratîk û xwediyê serbixweyiya siyasî, ji taybetmendiyên PDK Îranê ne.

Navbirî herweha rêberiya bi kom, weke yek ji afirandin û şanaziyên PDKÎ di dîroka tevgera rizgarîxwazî ya netewa kurd de hesiband.
Di dirêjiya rê û resmê de peyama hevpar ya Yekîtiyên Lawan, Jinan û Xwendekaran ji aliyê birêz Êlham Çayçî, Sekretêra Yekîtiya Jinan ve hat pêşkêşkirin.
Deqa peyamê li rûpel 2 û 3'ê de hatiye.

## Obama Esed hişyar kir


**Mifahsatandin ji çekên kîmyayî"hêla sor" a me ye**
Barak Obama, Serkomarê DYA'ê, roja duşemî, 20'ê Tebaxê lid or mifah standin ji çekên kîmyayî û biyolojîkî, hişdarî da Beşar Esed û ew yek ji bo Amerîkayê bi "hêla Sor da zanîn.
Wî da zanîn ku ew çekên Sûriyê bûne sedema nîgeraniya Amerîka û hevalbendê wê Îsraîlê. Wî tekez kir ku her çend heya niha me tu hewlek jib o êrîşa leşkirî li dijî rejîma Sûriyê nine, lê mifah standin û veguhastina wan çekan jib o me hêla sor e û de hemû nirxandinan tevlîhev bike.



**Mît Ramnî:**

## Gef ji Îsraîlê, gef ji mirovahiyê ye

**Mît Ramnî, rejîma Îranê bi rêjîmek Qewimkuj nav bir û ragehand ku, Amerîka berpirsyar e di warê bidestveanîna çekên etomî ji aliyê Komara Îslamî a Îranê ve.**
Mît Ramnî berbijêrê Partiya Komarîxwazên Amerîkayê di hilbijartina Serkomariya vî welatî, di bersiva gotinên Mehmûd Ehmedînejad, li dor jinavbirina hebûna welatê Îsraîlê di cîhanê de, ev axaftin kirin.
Navbirî herweha bal kişande ser kuştara Cihûyan bi destê Almana Nazî û got; me gelek cînayet û hovîtî di dîrokê de dîtine, lewra em qebûl nakin ku bînerê ducarîbûna karesatek weha bin.



## Sergotar

### Gavek dereng, lê pozetîv

**Selîm Zencîrî**

Hizbulaha Lubnanê, rêkxistinek çekdar, bihêz û îdeolojîke şîî ye li qada siyasî a Lubnan û deverê de. Rêxistinek ku li biyavên madî, menewî û locestîkî ve ji hêla erbabên xwe li Sûriye û Îranê de tê saport kirin, loma hevsarê wê jî li destê erbabê wê anku, Komara Îslamî de ye û çi sazekê lêbixe, neçare ku wusa bireqise û gor dilê wan tevdigere.
Ji avabûnê ve heya niha, ew rêxistine berdewam li xizmeta berjewendî û pêşxistina siyasetên rejîma Îranê li dever û cîhanê de bûye. Gelek kiryar, pilan û meremên mirar û terorîstiye rejîmê ji riya wan û bi destê endamên wê rêxistinê ve hatine encam dayîn. Meremên ku li arasteya dijberî kirina azadî, aştî, aramî û asayîşa deverî û navnetewî de bûne.

Bi taybetî terora kesatî û rêberên opzîsyona Îranê, û yek ji wan jî yên PDK Îranê bi hevkarî û hevdestiya wan bû.Herweha li 17 mehên şoreşa Sûriyê de xwe ji tu cinayet û hovêtiyekê hevterîb li gel rejîma Esed li dijî xelkê bêguneh, azadîxwaz û mafxwaz ên Sûriyê neparastiye û têhnêtiya xwe bi xwîna wan dişkîne.

Niha piştî ewqas salan bi ser karên terorîstî, cinayet afirandin û têkderiyên vê rêxistinê ve, DYA'ê ew xiste nav rîzbenda rêxistinên terorîstî de û niha şûn de dê bikewe ber şopên givaş û tehrîmên wî welatî. Bêguman gavek han, herçend ku dereng ket, lê dîsan jî gelek erênî û li cih de ye û serbare wê ku zêdetir rûçikê terorîstî û hove vê rêxistinê û erbabên wê nîşanî dunyayê dide, herweha destê Amerîka û civaka navnetewî jî vekirîtir dihêle daku givaşên zêdetir bixe ser û destê wê li gelek biyavan de kurt bike. Gavek ku renge yekhelwestî û yekdengiyek cîhanî li dijî Hizbulahê dû xwe re bîne.

www.arsivakurd.org

**Hesen Şerîfî, cihgirê Sekreterê giştî yê PDK Îranê, roja çarşemî,25'ê Gelawêjê, di rê û resma bi munasibeta 67 saliya avabûna PDKÎ de, bi nûneratiya Deftera siyasî peymek pêşkêş kir ku deqa axaftina wî li jêr de hatiye:**

# Her neteweyek nexwaze jinav biçe, ji nav naçe




**Hemwelatiyên hêja!**
**Xûşk û birayên rêzdar!**
**Mêhvanên ezîz!**

Îro 25'ê Gelawêja sala 1391'an ya Rojî, 67'emîn salvegera avakirina PDKÎ û di hemen dem de 70'emîn salvegera avakirina Komeleya J-K' ê, ew rêkxirawa ku 67 sal berî niha Partiya Demokrat a Kurdıstanê li ser bingeha teşkîlatî ya vê rêkxirawê hate avakirin, seba vê yekê em bi navê Deftera Siyasî û rêberiya PDKÎ û bi navê we hemûyan pîrozbahiyê ji tev alîgir û endam, kadr û pêşmerge, rêberiya PDKÎ û tewaya civatên xelkê Kurdistanê dikin. Yên ku li hemû rewşekê de palpiştê bihêz ê partiya hezkiriya xwe bûn. Herweha bi vê boneyê ve, em serê rêz û hurmetê ditevînin bo avakerên PDK û li serweyî hemiyan pêşewayê nemir Qazî Mihemed, û ew rêberên ku paştir li vejandina partiya me, li ser bingeha rêbaza rast û serdemiyane, kar kirine û îza kêşandine.

67 sal berî niha li rojek wek îro de bi hewl û tekoşîna pêşewayê nemir Qazî Mihemed û hemû ew xebatkar û nîştimanperwerên ku li hewla azadî û rizgariya neteweya Kurd didan, li sala 1324'an de hate avakirin, hewcehiya avakirina PDKÎ çi bû, em heke qala tewaya wan aliyan bikin ku hewcehiya avakirina partiyekî bi vî awayî hildigre, renge gellek caran gellek alî hewce bin ku em îşareyê bi wan bikin, lê heke em weha danên ku partiya demokrat li vê demê de nehatiba avakirin, lê komara Kurdistanekê ji dayîk biba, kiyaneke Kurdî yekem car li şêweya komarî de û bo yekem car li dîroka Kurdewarî de serî hildaba û rûpelên dîroka bizûtneweya Kurdî pê hatiba xemilîn, tu bêjî ew kiyan bi bê PDKÎ weha nawerokek demokratîk heba ku ji aliyê PDKÎ hate avakirin. Piştî hiloşîna Komara Kurdistan heke PDKÎ nehatiba avakirin, tu bêjî weha tekoşîn berdewam kiriba, yan xewn û xeyala şah li warê hebûna girawa aram li salên 1346-1347 de hatiba alozkirin.

Gelo tu bêjî heke PDKÎ nehatiba avakirin, li mehên pêş û piştî serkevtina şoreşê de partiyek hatiba avakirin û bikarîba bi sedan hezar kesî û bi milyonan endam û alîgirî li dewra xwe kom bike, gelo heke vê partiyê reh û rîşe di nav bîr û mêjiyê civatên xelkê Kurdistanê û xortên Kurd de tuneba, piştî vê ku gelê Kurd bi awayek aştiyane daxwaza mafê xwe ê rewa kir, lê bi awayek hovane ji aliyê rejîma Îranê ve hate tepeserkirin, vê weha bikarîba li qada xebat û tekoşînê de bisekine, her çend ku ew li hinek pîlanên xwe de serkewtin û çend rêberên me jî ji me sitandin. Lê partiya me her mezin û di naweroka xwe de demokratîk ma. ku weha bû her li yekemîn roja avabûnê ve heya niha heke em li bûyeran û li herketa vê partiyê binêrin, û li karîgeriya vê partiyê li ser tevgera Kurd li Kurdistanê binêrin, bixwe wê demê hewcehiya avabûna vê partiyê diyar dibe.

> **PDK Îranê, Partiyek e ku li ser bingeha realîstî û rastiyan ve siyasetê dike**

Ya girîng tenê avabûna vê nine, belku mana wê ye. Em hemû bi taybet yên ku li ser dîroka Îran û Kurdistanê zêdetir ji ên din şareza ne, dizanin ku hinek partî û sazî hebûn ku di gel PDKÎ yan jî berî PDKÎ hatin avakirin, lê li pêvajoya dîrokê de yan ji nav çûn, yan jî bandora wan li ser bûyeran nemaye. Lê PDKÎ ji caran qahîmtir û bi bandortir ma. Ew partiyên din li ser du tiştan li nav xwe de kêşe û nakokî hebûn.

Ya yekemîn ew bû ku wan nedikarî xwe di gel serdem rêk bêxin, û li gel xwastek û daxwaziyên xelkê xwe bin, û her li ser baweriyên xwe yên destpêkê de pêdagir bûn, û ya duyemîn ew bû ku ew li pêwendiyên xwe de gellek salim û pak nebûn, lewra her tim wek pêrewê aliyek yan jî welatekî din lê dihate nêrîn, û di rastî de serbixweyiya xwe ya siyasî ji dest dan, yan jî ji nav çûn, yan jî tenê bi nav man. Lê PDKÎ ji ber ku li gel guherînkariyên cîhanê çû pêş, wê demê take siwarê qada xebatê bû heta niha jî.

Taybetmendiyên vê hizbê tenê evne nebûn, belku her demekê ku kêmekê ji serbixweyiyê dûr ketibe, bilez rêberên wê dest bi kar bûne, bona ku wê vegerînne ser rê û rêbaza wê ya eslî. Êdî li wan çar dehikên dawiyê ên temenê vê partiyê de serbixweyiya siyasî bûye xala herî bihêz ya wê, û bi vê tê naskirin. Li hemû qonaxekê de vê partiyê kariye xwe li gel pêvajoya guherînkariyan rêk bêxe. Dema ku Komeleya J-K tê avakirin, piştî sê salan her di vê rojê de wate li 25'ê Gelawêjê de rêberên wê û heman endamên wê, roja avakirina Komeleya J-K dikne roja avakirina PDKÎ. Yan eva ku em dibînin li rewşa wê demê de ku bîr û baweriyên çep zal bûn, PDKÎ sosyalîzma demokratîk xiste rojevê de.

Herçend wê demê kete ber êrîşên cur bi cur û gellek boxtan lê hatin kirin, lê heta bo wan dijberan jî îro rojê helwêstên durust ên partiya me rohn û eşkere bûne. Ew yek ji me re cihê şanaziyê ye. Taybetmendiyek din ya partiya me rastbîniya di siyasetê de bûye. Dema ku bûyerek hatibe pêş, me guh nedaye rewşa zal bi ser partiyên din yan bi ser civakê de.

Me lêkdaneweya xwe hebûye û me helwesta xwe û bîr û bawera xwe eşkere kiriye. Helbet gellek caran em hatine tometbar kirin bi vê ku me direng helwest girtine, yan helwestên me ne durust bûne, lê ez hewce dizanim ku li wir îşareyê bi wan helwestan bikim ku ta çi qasekê helwestên me berî gellek partiyan bûye û mentiqî jî bûne. Bo mînak dema ku Axundan li Îranê de deshilat bi destve girtin û xwastin ku azadiyan li gefiyê de bifetisînin û şoreşê ji rê derxînin û rejîmekê wek ya niha ku em dibînin ava bikin, û wê demê gellek rêkxiraw û aliyan ew wek şoreşger û dijî împiryalîzm dihesibandin, û vî çaxî gelek kes û rêxistina xwe li bereya PDK Îranê dûr xistin, lê îro rojê derdikewe ku helwêsta me çi qas li ser bingeha rastbîniyê bûyê û rê neda ku em bikevne bin bandora rewşa nerast a siyasî di qonaxên cur bi cur de.

Dema tevgera reformxwaz serî hildide gelek kes dikevin bin bandorê û jê re diruşman didin, lê PDK Îranê dibêje ku reformxwaz nikarin tu karekê di rastaya çaksaziyê di Îranê de bikin û di sîstema Komara Îslamî de Îslahat û çaksazî cih nagire, lewma nakeve bin bandore wan û xwe ji wan dûr dixe. Ev kesên ku ketin şûna reformxwazan, hekî nebêjim niha li ser baveriya me ne, ku siyaseta me dirust bûye, dikarim bejim ku siyasetên PDK Îranê piştrast dikin.

Heyamekê rewta kesk xwe derxist ta ku Îranê rizgar bike, gelek kas ketin şûna rewta kesk û em jî tawanbar dikirin, lê dîsan jî em neketin bin bandora hereketa han û me nêrîna xwe hebû li ser wan kesan ku digotin dixwazin di Îranê de çaksaziyan bikin, çonkî wan kesan ne karnameyek baş di dîroka deshilata Komara Îslamî de hebûn, û ne bernameyek baş û rohn hebûn bo pêşeroja Îranê.

Kesekê ku tu program û karnameyek baş tunine, çava dikarim baweriyê pê bikim ku dikare wan çaksaziyan bike? Eva û gelek mînakê din fakter in bo îsbata vê yekê ku PDK Îranê, partiyeke ku siyasetê li ser esasa waqi'bîniyê dimeşîne, nek li ser esasa xewn û xeyal û cewa nebaş û nasalim a siyasî de.

Partiya me serbarê taybetmendiyên xwe, eva ku dibêjin di siyasetê de dayk û bav tunine û tev xapandine, ret dike û li ser vê baweriyê ye ku rêberên me bi awayekî em elimandine ku exlaq di



www.arsivakurd.org

### Hesen Şerefî:

# Bêy demokrasî, mafên netewî misager nabin, ger misager bin jî, garantiyek bona parastina wan nabe



siyasetê de dikare dewrek pir giring bilîze. Hekî di siyasetê de exlaq tunebe, ev hêza ku di siyaseta xwe de exlaqê berçav negire, nikare heya heyamek dirêj cihê baveriya her kesekê bimîne. Ji bilî wan taybetmendiyan, PDKÎ gelek diyardeyn nû weke rêberiya bi kom, di nava tevgera azadîxazî ya gelê kurd de bicih kiriye.

Lewma partiya me rêberiya bi komel anî nava tevgera kurdî de, da ku hekî serê tevgerê bibirrin, cardin laşê tevgerê bikare serek din çê bike. Pêşewa û Dr. Qasimlo û Dr. Sadiq, xelkê me weha perwerde kirine ku berdewam bîr ji programek siyasî bike, eva jî yek ji ciyawaziyên dinê ye ku me di gel tevgerên berê ê xwe de hebûye.

Herweha ew cudahiya me di gel beşek zaf ji xelkê Îranê jî heye, niha jî xelkê Îranê li pey rêberek karîzma digere, îca çi Muntezirî be, Kerûbî be, Xûmeynî be, Reza şa be, yan Mûsediq be. Niha jî di Îranê de xelk hîn nebûne ku weke kurdistanê bi şûn bernameyek siyasî de bigerin, eva jî yek ji afirandinên PDK Îranê ne, ku li pey programek siyasê bikevin.

Ev siyaseta rast û waqi’bînane, ev hemû xwîna ku tekoşerên partiya me dane, ev hemû bendên girtîgehan ku xebatkarên demokrat tijî kirine, ev dirêjîdana xebatê, weha partiya me di nav dilê xelkê kurdistanê de cêgîr kiriye, lewma gelê kurd jî weha bi can û bi mal di xizmet partîzanêt PDK Îranê de ne, û di tev qonaxekê de bûne çeper bo xebatkarên vê partiyê.

Eva yek ji teybetmendiyên PDK Îranê ne ku hekî partiyek xwedî siyasetên weke partiya me nebe nikare bibe xwedî taybetmendiyên han. Niha partiya me bi vê meremê ku li ser bingeha vê hatiye avakirin, bi rewta xwe ya dîrokî ku bi serbilindi heya niha derbaz kiriye, bi rewşa ku niha têde ye, bi zerfiyeta xwe ber bi serdema îro ve diçe, û niha di rewşekê de ye ku di hundurê kurdisatan û Îranê û bi taybetî li astê civaka navnetewî de jî hisab jê re tê kirin. Lê bi qasê meznahiya wê jî çavnihêrî jê tê kirin.

Çavnihêrî tê kirin ku di rewşek weha de rolek esasîtir, zindîtir û çalaktir bilîze. Lê gelo di kîjan rewşê de? Di rewşekê de ku di welatê me Îranê de, Komara Îslamî pitir ji caran ji xelkê re hatiye nasîn û xelk jê bêzar e, ji bilî pêgeha xirab a siyasî ku ji aliyê abûrî de jî, di rewşek şepirze de ye, pêgeha olî û mezhebiya xwe jî ji dest daye û pêrew û xwe bextkerên wê jî weke caran di pêxemê de xwe bext nakin, arîşeyên navxweyî, rewşa xirap ya xelkê, hemû evane pêvajoya berberekanî û rewta xebata me xweştir dikin.

Derheq welatên derve de jî gelek arîşe û kêşeyên teybet bi xwe hene ku ez bas jê nakim, çûn hûn hemû bi dirêjahiya rojê li ser sayt û malperan, di nûçeyan de dibînin ku çiqas rejîmek qirêj e, û di bîr û baweriyên cîhana derve de jî çava hatiye naskirin, eve jî bixwe cardin riya me xweştir dike.

Ji aliyek din ve em dibînin ku rewtek ji guhertinan di cîhan û derdora me de di rê de ye, guhertin di hindek welatan de pêk hat, hindek welat di halê guhertinê û guherînkariyê de ne, û hinek welat jî li benda guhertinan in, lewma dibe em çavniher bin û tev egerekê li berçav bigirin û tev têbîniyekê pêşbînî bikin û xwe ji bo her rewşekê amade bikin, da ku di dema rûdana rewşek taybetî de bikarin weke wezneyek qurs û giran di pêxema berjewendiyên netewa xwe de bin.



Bi vê meremê jî em li ser vê bawerê ne ku natewa me û bi taybet hêzên siyasî ên Îranê dibe yekgirtî û yekdeng bin, bi vê mebestê jî me bihîst ku di çend rojên derbazbûyî de, di pilînoma dawî ya partiyê de serbarê vê ku şeş sal berî niha hinek hevalên me ji partiyê veqetiyan, digel vê ku me pir hewil da ku ji partiyê neveqetin, di gel vê yekê ku me pir hewil dan ku piştî veqetiyana wan yekrêziyê derxin hole, lê mixabin serkevtî nebûn, lê dîsan me dixwest ku destpêşxeriyek din bikin û di daxuyaniyekê de pêşniyara diyalog û rûniştina rasterast digel hevalên veqetiyayî ragehand. Me bi niyazpakî û dilek saf biryara han daye û niha jî her kesek çavan şirove dike û bi reşbînî lê dinêre, keyfa xwe ne, ya girîng ew e ku me bi niyetek pak karek weha kiriye bo bidestveanîna yekrêziyê.

Hevalên me yên berê di daxûyaniyekê de bersiva me dan. Bersiva wan cihê dilxweşiyê ye çûnkî pêşwazî ji biryara me kirine, lê peyv û risteyên weha têde ne ku guman jê tê kirin ku şert bin û şert nikarin bendorek baş bixe ser diyaloga me. Hekî qirar be hinek mijar ku bixwe afirînerê arîşe û nakokiyan in, berî rûniştin û diyalogê çareser bin, êdî rûniştin û diyalog manaya xwe ji dest dide. Em hêvî dikin ku weha nebe ku diyare.

Lê di demek herî zû û di rewşek munasib de rewş bo vê hevdîtin û diyalogan bihê xweşkirin û têde babeta han bikeve ber bas, da ku pêwîstiya yekrêziyê ku daxwaza PDK Îranê ye bihê desteberkirin. Em hêvî dikin ku bersiva niyazpakiya me bi niyazpakî bihê den û em bigehne encamek baş. Tekoşîna me jî bi tenê bi vê hindê nasekine. Rûniştinên me tevî tewaya aliyên din ên kurdistanî berdevam in, babetên hevpar di navbera ma de hatine destnîşan kirin û hêvî dikim ku ev rewta ku ber bi dawiyê diçe bi dawî bê, û di munasibetekê de we ji encamên wê agehdar bikin.

Li her rewşekê de me her druşmeke bingehîn hilgirtbe bê guman me du tiştên bingehîn berçav girtine, meseleya neteweyî li Kurdistana Îranê û demokrasî, lê li qonaxên cur bi cur de her carê bi awayekî hatiye formole kirin, li çarçoveya federalîzmê de, li çarçoveya otonomiyê de, lê her çawan be, merem demokrasî û mefê netewî ye. Li ser wan çemk û destewajeyan gellek caran li nav partiya me bixwe de jî behs û gengeşe hebûye, lê me kariye bi hûrbîniyek zaf ve li navbera her duyan de hewsengiyê ragirin.

Carna li nav PDKÎ de fezayê nasyonalîzmê ew qas zal bûye, ku gihaye nasyonalîzmeke berçavteng. Lê PDKÎ bi vê hewcehiya ku me bi demokrasiyê heye wek palpişt ji bo mafê netewî, bi awayekê ew yek parastiye ku nehêlaye bêreng be li hember nasyonalîzma berçavteng de.

vê demê ku îdeolojiyên cur bi cur bi Çep ve bi ser civaka me de zal bûne, û xwastiye ku meseleya neteweyî kêmreng bike, û bêje ku em hemû birayê hev in, û misilman in, û li îdeya çep de her tişt cîbicî dibe, lê PDKÎ zaniye ku bê demokrasî mafê neteweyî nayê garantîkirin, û bi bê mafê netewî jî li Îranê de demokrasî bê wate ye.

Serbarê wana ew çavnihêriya ku ji PDKÎ tê kirin, heq û di cihê xwe de ne, lê bila em jî çavnihêriya xwe ji wan ragehînin ku ew jî dibe çav li pêvajoya bûyeran û guhertinan bikin, ku rolê xelkê li rex partiyên siyasî çawaye.

Bi vî awayî hem çavnihêriya me ji wan, û hem jî çavnihêriya wan ji me, vê encamek baş hebe. Jiber ku em ji yektir cuda ninin û em hemû xortê neteweyekê ne. Û ji bo yek armancî xebatê dikin. Em tevî tewaya hêzên Îranî her li nav gotûbêjan de ne , gellek hêsan nine ku gotûbêj li gel kesên ku heyamekê dijî mafê netewî bûn , û mafê netewî wek tehlûkeyekê dihesibandin, li çend rojan de bigîje encamê. Me pêngavên baş hilgirtine, gellek daxwaz hatine qebûl kirin, lê hinek tişt mane.

Carek din ez salvegera avakirina PDKÎ partiya hezkiriye me, partiya hizkiriye xelkê Kurdistanê li we pîroz dikim, serkewtin ji bo vê partiya tekoşer e ku ew qas qurbanî daye û îza kêşaye, û ew rêberên mezin ji dest dane da ku bigîje armancên xelkê Kurdistanê.

Ez xatircem im ku neteweyek ku nexwaze ji nav here, qet ji nav naçe, neteweyek ku bixwaze mafê xwe bi dest bixe, wê rojgarekê mafê xwe bi dest bîne, renge rewş bandora xwe li warê zemanî ve li ser danê, lê li riya xwe de dernakeve. Em vê serkevtinê ji Kurdan bi giştî û Kurdên Kurdistana Îranê û PDKÎ re hêvî dikin,leşsaxî û temendirêjî ji bo we hemiyan, û serkewtin bo partiya me û neteweya me.

# Daxuyaniya Hevbeş

Li doma hevdîtin û civînên hevbeş ên PDKÎ û Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşên Kurdistana Îranê bo bas û şiroveya pirsên girîng ên herêmê û têkildar bi pirsa Îranê bi giştî û Kurdistanê bi taybetî, herweha di doma bas û gengeşeyan ji bo amadekirina lihevhatineke hevpar bo alîkarî û hevdengiya di navbera wan de ku heyamek bû ji aliyê heyeta rasispartî a her du aliyan ve kar jêre dihate kirin, roja sêşemiyê 31'ê Gelawêja 1391'an a Rojî (21'ê Tebaxa 2012'an a Zayînî) heyeteke rêberiya her du aliyan li binkeya Deftera Siyasî a PDKÎ bi serperestiya rêzdaran Ebdulla Muhtedî sekreterê giştî ê Komelê û Mistefa Hicrî Sekreterl giştî ê PDKÎ li hev civiyan.

Her du heyetan di civîneke pênc demjimêrî de, tevî baskirina pirsên giring, rewşa Îran, herêm û cîhanê, bas û gengeşeya xwe ya pêştir li ser amadekirina lihevhatinekê bo alîkariya di navbera xwe de domandin û bi vî awayî ew rewt gihandin encamê, û lihevhatinek ji aliyê rêzdaran Mistefa Hicrî û Ebdulla Muhtedî ve hate îmza kirin.

Herweha her du aliyan hêvî xwastin ku naweroka vê lihevhatinê rê ji bo alîkariya berfirehtir ya di navbera hêzên siyasî ên Kurdistanî de xweş bike.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Komeleya Şoreşgerên Zehmetkêş ên KurdistanaÎranê**
**31.05.1391**
**21.08.2012**

# Rêketinnameya hevpar

**Rêketinnameya han li navbera PDK Îranê û Komeleya Şeroşgerên Zehmetkêş ên Kurdistana Îranê tê wajo kirin û niha şûn de li her cihek vê rêketinnameyê de Komele û Hizba Demokrat hatibin, merem her du rêxistin in.**

**Destpêk**

Tevgera rizgarîxwaziya gelê kurd li Kurdistana Îranê bi salan e ku qonaxên ciyawaz ên xebata pirr ji ewraz û nişîv a xwe derbas kiriye. Berxwedana netewî, qurbanîdan û şehîdbûna bi hezaran keç û xortên fîdakar ku li pêxem selmandina şunas û mafên siyasî ên neteweya kurd de ku li serweyî hemûyan misoger kirina mafê diyarî kirina çarenivîsê ye, rastiyek haşanekirî ye.

Ji bo xebata gelê kurd li vê serdemê û li vê rewşê de, him guhertinên cuda ên cîhanê û him jî guhertinên vê dawiyê ên Rojhilata Navîn, herweha balansa zilhêzan li hevkêşeyên nû, zêdetir ji herdem delîve û derfet ji bo anîne rojeva xwastên netewî ên gelê kurd û pêdagiriya zêdetir li ser mafên wê li asta cîhanê de afirandiye.

Bahoza guhertinxwazî û demokrasîxwaziya xelkî a devera Rojhilata Navîn bihêztir û xurttir ji her demekê koşka dîktatoran ber bi hiloşînê ve pal daye. Dereng yan zû dîktatoriya Komara Îslamî jî li Îranê de, bi berdewam bûna xebata civatên xelkê û îradeya qahîm a xebatkarên riya azadiyê, tu asoyek xincî xurtbûna kirîzên tevalî ên aborî û siyasî û çûna ber bi herifîna yekcarî jêre nahê dîtin.

Opozîsyona Îranê û gurûp û aliyên neyare Komara Îslamî li derveyî welat, li du sê salên derbasbûyî de piştî serhildan û şikesta tevgera Kesk li Îranê de dewrek nû ji diyalog û rûniştina hevbeş û çalak dest pê kirine. Li vê navberê de serbarê cudahiya nêrîn û bîr û rayan, hinek jihev têgihîştinek zêdetir û nizîkbûn li gor derbasbûyî derketiye rojevê û hizra hevgirtin û şêwazek ji hewildan bo pêkanîna bereya demokrasîxwaziyê bi durûşma guhertina rejîmê zêdetir ji berê alîgir peyda kiriye.

PDK Îranê û Komeleya Şoreşgerên Zehmetkeş ên Kurdistana Îranê weke du hêzên bi ezmûn ku li vê midehê de li ser komek pirsên girîng hevkarî û karên hevbeş bi encam gihandine, li doma pêvajoya rû ji geşeya vê nizîbûn û hevkariyan de, her du alî li ser vê baweriyê ne ku li rewşek weha de, rêketin li ser komek xalên bingehîn ên hevbeş li gor naveroka vê gelaleyê de hewcehiyek înkarnekirî ye. Li rastî de ev pilatforma hevbeş, weke serekîtirîn ecîndaya siyasî li hember guhertinên vî serdemî de, eyanker û guzarişt li hevalbendiyê li navbera her du hêzan de dike.

Ev rêketinnameya hevbeş ku ji aliyê rêberiya her du partiyan ve hatiye pesend kirin, dê bingehekê ji bo karê hevbeş yê her du aliyan li warên siyasî, dîplomasî, ragihandin û ...htd dabirêje. Li heman dem de bingeh e bo xebata hevbeş ji bo xurtkirina vê rêketinnameyê û misoger kirina hevkariyên zêdetir li navbera hêzên din ên mayî li Kurdistana Îranê de.

**A) Binemayên giştî:**

1: Her du alî li ser vê baweriyê ne ku bi bêy hiloşîna rejîma Komara Îslamî, demokrasî û mafên netewî ên gelên Îranê û bi taybet gelê kurd misoger nabin. Herweha li vê bawerê de ne ku sîstema siyasî a pêşerojê di Îranê de hewce ye sîstemek sekolar a demokratîke Federal be, lewre hewce ye her du alî li kom û civînan de bi opozîsyona Îranî û derve li ser van xalan tekezê bikin.

2: Komele û Hizba Demokrat baweriyek tewaw bi hilbijartinên azad ên siyasî ji aliyê xelkê Kurdistanê ve hene û li hilbijartinên han de bêşik sindoqên dengdanê, bi serekîtirîn çavkaniya rewatiya hemû hêzek siyasî li Kurdistanê û bi bingehek serekî a demokratîzekirina civakek azad û serbest dizanin.

3: Her du aliyan baweriyek tewaw bi cudahiya dîn ji dewletê hene û li vê bawerê de ne ku desthilata pêşeroja Kurdistanê û Yasaya Bingehîn a welat divêt li ser bingeha pirensîpên demokrasî, peymannameya cîhanî a Mafên Mirov, mafên siyasî û netewî ên xelkê Kurdistanê bihê danîn. Herweha azadiya dîn û bîr û bawerên cuda li Kurdistanê bi mafek rewa û haşanekirî ên hemû rûniştiyên Kurdistanê dizanin.

4: Her du alî pêdagiriyê li ser wekheviya tewaw a mafên jin û mêran li hemû biyavên siyasî, civakî, aborî, çandî, malbatî û htd li civakê de dikin û xwe bi parêzerê yasyaên pêşketixwazane, modern û mirovî li vê derheqê de dizanin û ji bo cihgîrkirina wê dê bixebitin.

5: Komele û Hizba demokrat xwe bi parêzerên azadiya derbirîn, azadiya nivîsîn, azadiya rojnamevaniya serbixwe, azadiya pêkanîna rêxistinên siyas, azadiya avakirina rêxistinên medenî û sinfî weke rêxistinên karkerî, jinan, xwendekarî, lawan, mamostayan û htd dizanin û piştgiriya tewaw a yasayî li civakê de lê dikin.

6: Her du alî piştgîrî û pabnedbûna xwe bi dadvaniya civakî û parastina jîngeha kurdistanê û cihgîr kirina van babetan li Yasaya Bingehîn a welat de radigehînin.

7: Her du alî pabendbûna xwe bi çareserkirina pirs û astengên siyasî ên li navbera xwe ji riya diyalog û bi awayê siyasî, ara m û bi dûr ji her terze şidet û tund û tûjiyekê tînin ziman. Herweha vê şêwazê jî li navbera hemû hêzên siyasî ên Kurdistanê bi hewce dizanin û ji bo cihgîrkirina vê pirensîpê li rûberê hemû kurdistanê dê bixebitin.

8: Hizba Demokrat û Komele, Federalîzma Netewî – Coxrafiyayî weke durûşma sereke û bernameya siyasî a xwe ji bo çareserkirina stema netewî li Kurdistanê hilbijartine û xwe bi alahilgirê vê durûşmê dizanin û karê hevbeş bona cihgîr kirina wê dikin.

9: Rêketinnameya han, pirensîba serbexweyî a siyasî, rêxistinî, dîplomasî û ragihandinî a tu yek ji van du aliyane birîndar nake, belkî hewil dide ku hevdengî û hevahengî li navbera wan de li pêxema armancên hevbeş ku li vê pilatformê de hatine, misoger bike.

**B) Erkên pêş guhertinên siyasî û hiloşîna rejîmê**

1: Nasandina pirsgirêk û xwastên gelê kurd li Kurdistana Îranê bi civaka navnetewî û misoger kirina piştewaniya siyasî ji bo tevgera rizgarîxwazî a gelê kurd. Bo nimûne rêxistina çalakiyên dîplomatîk ên hevbeş li asta cîhanî û serdana nawendên navnetewî bo vê meremê.

2: Beşdarîkirin yan nekirina hevbeş li gel hêzên opozîsyona Îranî bi hevahengî û şêvirmediya pêşwext û pêdagirî li ser maf û daxwaziyên xelkê Kurdistanê bi armanca bihêz kirina pêgeha kurd ji riya helwesta hevbeş li konferans û semînarên cuda û hevahengî li vê biyavê de. Tekeza her du aliyan li ser durûşma federalîzmê, weke rêçareya pirsa netewên Îranê li nav gotarên cuda ên opozîsyona Îranê û kesatiyên neyare Komara Îslamî. Bihêz kirina helwesta hevbeş û gotara pêşketinxwazane a netewî li Kongireya Netewên Îrana Federal û pasrastina wê rêxistinê û nasandina wê bi raya giştî a cîhanê. Hewildan bona darêtina siyasetek hevpar li hember opozîsyona Îranî ku derbirrê pirensîbên esasî ên tevgera millî-demokratîk a xelkê kurdistan û ... be.

3: Her du alî piştewaniyê ji xebata rewa a gelê kurd li hemû parçeyên Kurdistanê de dikin û hevdem li ser vê baweriyê ne ku her terze desttêwerdaneke parçeyek ji parçeyên din, siyasetek nebaş û bi zirar e. Her li vê arasteyê de bona qahîm kirina pêwendiyan û misoger kirina pêgehek jêhattir ji bo kurdên rojhilatê û berçav girtina siyasetek hevbeş, li gor hewcehiyan, dê rûniştinên hevbeş bi hikûmeta Herêmê û hêzên siyasî li Herêma Kurdistanê encam bidin.

4: Komele û Hizba Demokrat, tebayî û yekêtiya netewî li Kurdistana Îranê û bihêzkirina hevxebatiyê li navbera hêzên siyasî ên Kurdistana Îranê bi erka ser milê xwe dizanin û ji bo vedîtina rêçareyên guncaw bi armanca jinavbirina astengên ser riya yekîtiyê dê bixebitin.

5: Her du alî hevra ne ku hevkariyên dualî li navbera xwe de xurt û bihêztir bikin. Li vê pêxemê de hevkarî li navbera organên pêwendîdar ên her du aliyan li warên ragihandin, weşandina daxuyaniyên hevbeş li ser bûyer û guhertinên siyasî ên girîng û karê hevbeş bona eşkerekirina siyasetên dijî gelî ên rejîma Komara Îslamî, yan her bizavek medenî û siyasî, bi awayekî jêhatî gavên piratîkî jêre bavêjin.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Sekreterê Giştî**
**Mistefa Hicrî**

**Komeleya Şoreşgerên Zehmetkeş ên Kurdistana Îranê**
**Sekreterê Giştî**
**Ebdula Muhtedî**
Gelawêja 1391 a Rojî,(Tebaxa 2011'an a Zayînî)

www.arsivakurdi.org

# Gola Urmiyê û pirsên siyasî yên têkildar





Salar Pûrhacî

Asta ava gola Urmiyê di van salên dawîn de gihîştiye qasê xwe yê herî nizm û kêm, her diçe kirîza golê kûrtir dibe. Ev kirîza xurt û zuwabûna ava golê, ji xeynî ku xesarên mezin heta niha gehandiye jîngeha Urmiye û herênmên derdor, bû sedem jî ku hemû balinde û çûkên niştecih ên vê golê bo hertim koç bikin û êdî tenê dîmenên tirsa mirinê ji wê bicîh bimîne. Di rewşekê de ku ev gol dikarî bibe yek ji navendên sereke yên turîstan û geriyanê, kirîzek mezintir û bixoftir li pêşiya wê ye. Çunkî ger ew gol zuwa bibe, herî kêm nîvek ji Urmiye û deverên derdorên bajar ji nav diçin û bi milyon mirovên rûniştevanên vê parêzgehê û bajarên derdorê dê aware û koçber bibin. Divê em bizanin, eger bala pêwîst ji bo çareserkirina kirîza gola Urmiyê neyê dayin, ew jî mîna gola Oral ku 15 qat ji gola Urmiyê mezintir bû, rastî zuwabûnê hat, ev jîngeha giring û hezar salî bi tevahî û di bin siya hikûmeta Komara Îslamî ya Îranê ji nav diçe.

Heta niha ne tenê ti hewildan di vê derbarê de negihîştine encamê, lê deng û rengê mirina xaka dîrokî û kevnar a Urmiyê tê bihîstin û dîtin. Yek ji sedemên sereke yên pêvajoya zuwabûna gola Urmiyê, çêkirina bendavên zêde ne ku li ser bingehek ne durist û plan û projeyên bê kêr ên dewletê bûne. Çêkirina wan bendavan ne tenê ti alîkariye ji herêmê re nekir, belkî bi qutkirina çavkaniya ava gola Urmiyê, ew xistin nav rewşek dijwar û bitxer ku pêşeroja wê zuwabûn e. 5 ji sêyê çavkaniya ava gola Urmiyê zuwa bûye û rêjeya şorbûna ava golê gihîştiye 350 mîlîgram di hr lêtrekê de. Eva di rewşekê de ye ku li dehsala 1970`an ev rêje gihabû 80 mîlîgrem. Wisa dixuye ku di bin siya rêveberiya hikûmeta olî ya Îranê dê ava gola Urmiyê zuwa bbibe û jîngeha derdorê ji nav biçe.

Sedem û kiryara din a xerab û neberpirsane ku dewletê meşand, çêkirina pira `Kelanterî` bû ku li naverasta golê hate avakirin. Di rastî de ev pira ne pirek normal e, belkî tenê navê wê pir e, ji ber ku xakeke zêde rijandin nav golê û bi kiyar gol ji naverastê kirine du perçe ku vê proja ne durist û ne pêwîst zerar û xesarên mezin gihandine sîstema geriyana ava golê û pêkhateya hedrolîkî ya gola Urmiyê.

Ji dema ku zuwabûna golê weke gefek ciddî û bixeter di ray giştî de deketiye rojevê û xelkê sivîl nigeranê wê bûye, xelkê herêmê jî bi awayên corbicor nerazîbûnên sivîl derbarê xemsarî û kiryarên xerab û ne berpirsane yên ewletê ji xwe nîşan dane. Bo nimûne belavkirina pirr gotaran di rojaname û belavokên giştî de, lidaxistina festîvalên hunerî û wêjeyî derbarê mijara rizgarkirina gola Urmiyê, ragehandin beşdarî û civînên giştî û girseyî li kêlek û beravên gola Urmiyê ku ti yek ji van kiryarên sivîl û çandî bandorek berçav nekiriye ser rewşa golê. Hikûmeta Komara Îslamî jî ne tenê ti balek neda van nerazîbûnên bi tevahî aştîxwazane, belkî heta ji dest hêzên ewlekarî û leşkrî hat xelkê nerazî binçav û girtin û li xelkê dan û gef ji hevwelatiyan xwarin.

**Rewşa desteserkiriyên nerazî bi gola Urmiyê**

Piştî pêkhatina nerazîbûnên xelkê sivîl li Urmiyê û bajarên din li hemberî zuwabûna ava gola Urmiyê û derketina rewşa ewlekariyê, hejmarek zêde ji çalakvanên kurd û azerî yên Urmiye û bajarên din hatin girtin. Ligel ku hinek ji wan girtî li bajarên cuda bi danîna rehînên mezin ên darayî hatine azadkirin, lê hêj 15 kes ji hevwelatiyên binçavkirî li girtîgeha Tebrêzê derbas dikin. Ji aliyekî din hejmarek ji çalakvanên sivîl ji aliyê dadgehên şoreşê ve cezayên giran ên wek zindan, cezayê pere û lêdana qemçiyan hatine mehkûmkirin. Komek ji van girtiyên binçavkirî piştî derketin ji mehkemeyan, li pêşberî malbatên xwe rûbirûyê lêdan û bêrêziyê hatin. Piştî nerazîbûn li hemberî van liv û tevgerên leşker û hêzên ewlekariyê û dozvekirinê, dadgehên Komara Îslamî herwiha girtî bi cezayê pere mehkûm kirin.

Ji bo ku bikarin cezayên giran bidin çalakvanên nerazî bi rewşa gola Urmiyê, rayedarên hêzên leşkerî idea kirin ku pirraniya wan xwedî dosyên nebaş û sûcbar in li dadgehan! lê ev tenê behane bûn da ku wan çalakvanên sivîl û civakî ceza bikin. Tevgera hêzên dewletê ligel wan wek tawanbaran bûye!

Ji ber desthilatdariya îdeolojîk û dîktator li Îranê, hemû pirsên xwezayî jî li vî welatî reng û şeklek siyasî li xwe girtine û ev yek ji şaşfikirîn û sîstemek ne demokratîk, berçavtengiya ramana neteweyî - panfarsîzm û olî çavkanî digire. Pirsa gola Urmiyê jî ketiye bin bandora van ramanan û bûye pirsek siyasî û ti gavekê bi awayekî profesyonel nehatiye nirxandin û dahûrandin û aliyên neyênî yên pirsgirêkê nehatine şirove û zelalkirin, herwiha ti hewildanek ji bo çareserkirinê nehatiye avêtin. Ji ber ku di bingeh de desthilatdarên Îranê baweriyek bi pirsporî û xebatên profesyonel nînin û heta pirsên fîzîkî û sirûştî jî li gor ramana îdeolojîk û teng a xwe mêze dikin. Rayedarên dewletê bi van kiryaran û bi taybet ji ber balnedan û binpêkirina sîtematîk a maf û azadiyên neteweyên kurd û azerî, dixwazin vê pirsê siyasî bikin heta ku bibe hincetek bona girtina çalakvanên sivîl û siyasî yên azadîxwaz ên Kurdistan û Azerbaycanê.

# Eva ku naheje, tenê wijdana berpirsan e



Îlham Çayçî

Erdheja wêrankere 6.2 riştêrî a roja Şemî, 26'ê Gelawêjê, li herêmên Eher, Herîs û Werzeqanê li Parêzgeha Azerbayicanê, xelkê Îranê xembar û kovandar kir. Li gor nûçe û agahiyên şahidên bûyerê, xelkê vê deverê di rewşek pir dijwar de bûne û bi taybetî heya midehekê zorahiya hewcehiyên despêkî weke av, xwarin û xedematên dermanî ji wan re nehatibûn dabînkirin. Amara herî dawîn ya goriyan ji aliyê rejîmê ve bi 306 kes mirî (ku piraniya wan jin û zarok in), û herweha sê hezar kes jî birîndar bûne. Lê serhejmariyên nefermî bas ji mirina zêdeyî hezar kesan dikin û didin zanîn ku rejîm ji dana zaniyariyên rast xwe diparêze.

Yekem hêza alîkar û hawarde çûnê ji aliyê rejîmê ve bo cihê bûyerê piştî 7 demjimêran ji rûdana erdhejê gihîştiye wir. Li halekê de ku dem pirr girînge ji bo rizgar kirina xelkê di bin kawilkan de. Lê mixabin giringînedan û xemsariya berpirsên rejîmê û retkirina banga alîkariyên cîhanî û nemaze navxweyî jî bû sedem ku hejmara goriyan zêdetir be.

Herweha bû sedem ku nerazîbûnek berfireh di nav xelkê beladîtî û xelkê Îranê bi giştî de pêk were. Eva bû bi pirsiiyar bo hemû aliyekê ku çima medyayên rejîmê li hember karesatek weha bijan û mezin de bêdeng man? Li halekê de ku li demên weha de xuya ye ku role ragihandina çiqas girîng û bibandor e li hişyarkirina xelkê û hawardeçûna wan û gihandina alîkariyan jib o lêqewmayiyan. Lê mixabin em dibînin ku heta nûçeya bûyerê jî piştî tewahiya nûçegihaniyên cîhanî ve hat belavkirin.

Erdheja bajarê Bem a Îranê jî bi vî halî de bû û piranî xelkê feqîr û destkurt bûne goriyê vê tirajîdiyê. Ji ber ku mal û awahiyên wan, kewn û ne standard in û li hemberî her bûyerek wusa de diherifin. Vir de jî asta hejariya xelkê Îranê mirov re derdikewe ku serbarê dewlemendiya xaka Îranê, lê niha jî xelkekî zaf hejar û destkurt in û rejîm jî tu hawriyekê ji wan nade û hemû samana giştiye welat, têçûya siyasetên mirar û fitnegêrane ên xwe li deverê û bo çeka navikî dike.

Xemsarî û guhnedana berpirsên rejîmê bi goriyên erdheja Azerbaycanê, carek din siyaseta dijî gelî a rejîmê bi nisbet xelkê Îranê da eyankirin. Bûyera han carek din selimand ku xelkê Îranê li hember xemsariyên rejîmê di haletên wusa de çiqas xisar hilgirin. Ji ber ku gorî pisporên erdhejnasiyê, Îran welatek e ku li ser hêla erdhejê de hilketiye û renge li pêşerojê de jî buyer û tirajîdiyên wusa dîsan biqewimin, lewre xelik dibe li hizra xwe de bin û bizanin ku bi çi çarenivîsekê re li bin siya vê rejîmê de ber bi rû ne û renge gelek carên din jî erd biheje, lê ya wek xwe dimîne û naheje, eva wijdana nivistî a berpirsan e.



www.arsivakurd.org

# Misr li ber ezmûnek dîrokî



Ebdula Hicab

Kuştina 16 nobedarên sînûr li ser sînûrê di navbera Misr, zîwala Xeze û Îsrailê de rê ji ber guhertinên çarenûssaz di sîstema birêveberiya Misrê de vekir. Muhemed Morsi serokê nûhilbijartiye Misrê bi awayek hinek çaverê nekirî serleşkerên herî bilinde artêşa welat ji kar avêtin. Di serî de general Huseyn Tantawî, serokê Konseya xwedî hêze Leşkerî û wezîrê parastinê û general Samî Enan serokê erkana artêşê bi serkirdeyên hêzên hewayî, bejayî û deryayî re ji kar hatin avêtin û li ciyê wan efserên nû hatin wezîfedar kirin.

Serokkomar her wisan ew guhertinên ku artêşê beriya radest kirina deselata piştî Husnî Mubarek di yasaya giştiye welat de pêk anîbûn hilweşand. Di demekê de ku parlemana welat bi awayek fermî ji aliyê Konseya Bilinde Leşkerî ve hatiye hilweşandin, biryarên serokkomar xweserî xwe hem yasaye hem jî rêbaza birêveberiyê.

Bêdengiya artêşê li hember wê biryarê nîşan da ku êdî tabo an tilisma deselata bê reqîbê artêşê hatiye betal kirin, û her nebe di dema niha de serokkomar karî qonaxa yekê ya pilanên xwe yên demdirêj ji bo ava kirina deselatek olî ya li gor siyaseta Îxwan El Muslimîn cî bi cî bike. Eger ew pilan bi xatircemî bi ser neketibe jî, bi kêmî manovrek siyasî bû ku carê bi qazanca serokkomar û Îxwanan diçe pêş.

Giringiya bûyerê wê demê pitir xuya dike ku rola artêşa Misrê di siyaseta welat de û serbihorî û dewra generalên ku niha ji kar hatine avêtin di pêvajoyên siyasiye dawiyê de li ber çavan re tê derbaz kirin. Artêşa Misrê hem heta niha yek ji aliyên herî xwedî bandor di siyaset û birêveberiya welat de bûye û hem di demên hesas de bi xwe bi awayek raste rast welat birêve biriye.

Hemû serokkomarên piştî hilweşîna sîstema paşatiyê li Misrê di sala 1952'de ji riya deselata xwe ya serbazî re derbazî posta serokkomariyê bûne. Di serhildana wê dawiyê ya xelkê Misrê li dijî deselata Husnî Mubarek jî dubare rola artêşê û general Tentawî çarenûssaz bû. Ji ber ku tenê wê dema ku ewan pişta xwe dane Mubarek, riya guherînan di welat de vebû û rêjîma Mubarek bi neçarî paşve gav avêtin.

Niha hemû ev generalên xwedî otorîte û deselat ji kar hatine avêtin û dezgeha birêveberiye artêşê, her nebe bi rûkeşî, li hember wê biryarê bê deng maye. Ev bêdengî tê maneya pejirandina biryara serokkomar û rûniştina otorîteya wî wekî fermandarê giştiye hêzên çekdar. Bi wê riyê ve serokkomar dibe kesê herî xwedî deselat li Misrê. Eger bê û artêş wê guherînê bi dil û ji bo heta hetayê bipejirîne, êdî serokkomarê nû wê bikare hemû pilanên xwe yên din ji bo ava kirina sîstema siyasiye li gor dilê xwe cî bi cî bike.

Lê li vir du pirsên sereke derdikevin; Ya yekê ka gelo çi armancên veşartî li pişt wê pilana serokkomarê nû hene? Ji ber ku nakeve çi aqilan ku ew bûyer tenê guhertina ciyê hinek generalan ji ber bê kêriya wan di parastina ewlekarî û berjewendiyên welat de hatibê encam dan. Pirsa duyê ewe ku wê encama wê biryarê li ser pêşeroja Misrê û ciyê welat di siyaseta herêm û cîhanê de çi be? Çunku hem cîranetiya Misrê bi Îsrailê re, hem ciyê Misrê di cîhana Ereb de gelek guman û pirsan çê dike bûyerên navxweye welat wê bi çi awayî karîgeriyê li ser derudora xwe danên.



Her çend Serokkomarê nû îdeayên ku dibêjin armanca wî ji wê pêgava nû xurt kirina sîstema parastina asayîşa hevwelatiyan li hember terror û tundutîjiyê de ye, lê nayê veşartin ku encama wê biryarê dibe xurt kirina deselata serokkomar û bi riya wî re jî xurt kirina bandora Îxwan El Muslimîn bi ser siyaseta welat de.

Dema kesayetiyên xwedî deselata herî mezin di artêşê de ji kar hatin avêtin, wê zehmet be ku generalên nû bikaribin heman otorîteyê di demek kin de bi dest bixin. Ji xwe eger bê û xwestekek wan ji bo hêştina deselat û bandor artêşê di siyasetê de hebe jî, wê ew xwestek bi riya Îxwan re here pêş.

Di asta navneteweyî de bûyerên Misrê di her astekê de bin û bi her awayî herne pêş wê karîgeriya raste rast danêne ser pêwendiyên wî welatî bi Îsrailê re. Ezmûnên şer û aştiya navbera her du welatan, pitir Îsrailê neçar dike ku bi çavên vekirî bûyerên Misrê bişopîne.

Artêşa Misrê hem bi awayek fermî bi Îsrailê re peymana aştiyê îmze kiriye û hem di warê ewlekariya sînûran de bi Îsrailiyan re hevkariyê dike, ku ew hevkarî bi qazanca her du aliyan diçe pêş. General Tentawî u generalên din yên ku ji kar hatine avêtin, eger çi dostên herî nêzîke Îsrailê nebin jî, lê her yek ji wan ji bo bi cî kirina peymana aştiyê bi Îsrailê re xwediye rolek diyar bûn.

Cîgirên wan, eger bê û bi yekcarî girêdaiyê Îxwan û serokkomarê wê bin, dikarin ji bo ewlekariya neteweiye Îsrailê bibin tehlîke. Di heman demê de ew guhertin dikare baweriya navbera du aliyan de jî kêm bike û di encamê de her du aliyan neçar bike ku sermayeyek pitir ji bo paşde dana gef û tehlîkeyên rengeyî ji aliyê din ve bi kar bînin. Ji bo artêşa Misrê, rewşek wisan dikare bê manaya ji dest dana alîkariyên diraviye Amerîkayê, ku ji bo artêşa Misrê serekaniya herî mezine alîkariyê ye.

Misr weke welatê herî mezin û xwedî bandor di cîhana Ereb de jî dema bi yekcari kete destê hêzên tundreve olî, dikare bandora raste rast li ser welatên Erebe weke Sûriye, Urdun, Libiya, Tunîs, Yemen, Elcezayêr û Merakêşê danê. Ne dûre ku bikaribe bi awayek ne raste rast be jî bibe hegerê guhertinan li welatên weke Erebistana Seûdî, welatên derdora Kendavê, Îraq, Lubnan û hwd jî.

Eger artêş û Îxwan li Misrê bi hev re bibin yek, bê guman wê alîkariyê bidin hêzên hevbîr û bi wî awayî hemû cîhana Ereb ber bi şêweyeke nû ji xelafetê ve bibin ku wê carê navenda wê dikare bibe Qahîre.

Ji pêvajoya nû ya siyasiye Misrê re jî rewşa nû dikare bê maneya veqetandina rê. Bi awayekê ku hêviyên jiyana bi hev re ya hêzên îlmanî û yên girêdayî Îxwan El Muslimîn dikare bê çal kirin. Di gel ku artêş tu gav piştîvanê hêzên îlmanî û alîgirên demokrasiyê nebûye, lê di parastina parsenga navbera aliyên îdeolojîk de, artêşê dikarî û dikare xwedî rolek giring be. Dema artêş bikeve destê oldarên tundajo wê demê parseng bi qazanca hêzên tundrev tê guhertin û sîstema siyasî û birêveberiyê bi yekcarî rengê tundajoiya olî bi xwe ve digre.

Pêkhateya etnîkî, olî û civakiye Misrê bi awayekê ye ku tenê sîstemek ilmaniye dûreperêz ji pêşhukmî û yasayên olî dikare berjewendiyên giştiye hemû hevwelatiyan û mafê hemû qadên civakê biparêze. Di demên hesas de, her dema ku di nava civakê de aloziyek derdiket, artêşê dikarî ji ber wê baweriya ku di nava civakê de bi dest anîbû, parsengê biparêze û nehêle ku aliyek bi ser aliyê din de bi ser bikeve. Dema artêş kete destê Îxwan û serokkomarê ciyê piştewaniya wan, wê demê wê komele û girûpên ku kêmaniyan pêk tînin baweriya xwe bi artêşê ji dest bidin. Ew rewş dikare ji arîşeyên mezin re rê veke û civakê ber bi aloziyên bi tehlîkeve bibe.

Artêşa Misrê heya niha nobedarê demokrasiyê û deselata sivîl nebûye, lewma kêm bûna deselata wê, eger bi riya demokratîk, li gor biryara parlemanê û bi merema xurt kirina deselata saziyên sivîl ba, wê ji bo demokrasiyê biba bingehek baş. Lê tirsa sereke ewe ka gelo çi hêzek wê ciyê otorîteya generalan bigre û wê ji niha û pêve artêş çawan bikeve xizmeta îdeolojiya deselatdaran. Ew rewş dikare senarioyek weke ya Îranê bixuliqîne ku ne ji bo demokrasiyê tu faydeya wê heye û ne jî ji bo ewlekarî u asayişa cîranan.

Di bin dudilî û gumanek mezin de, tenê rê ewe ku hêvî bê kirin serhildana Misrê ber bi dawiyê ve gavan neavêje. Ya ber bi aqilane ewe ku hem artêş xwe ji karubarên birêveberiya medenî paş ve bikêşe û deselata rastîn bispêre nûnerên hilbijartiye xelkê, hem Îxwan wê rastiyê bipejirîne ku êdî serdema vejiyandina xelafetek nû nîne.

Berjewendiyên Misr û herêmê di wê de ye ku kêşankêşa navbera Îxwan û Artêşê bi qazanca pêşvebirina demokrasî û vebûna siyasî bê bi kar anîn û bi wê riyê deriyê demokrasiyê bê vekirin. Ew rewş wê bandorê li ser hemû heremê danê û ji bo serhildana Sûriyê û welatên dine Erebî jî bibe mînakek baş. Li derveyî wê yekê, wê peşkên agirê ku li Misrê pê dikeve, hemû herêma Rojhilata Navîn bigre.

# Niqurçk

## Jinxal bêt? Bila reş û rûtên xwe bide dû xwe û bêt!!!



Ceifer Mubeşirniya

Desmalê desmalê hayê hayê, desmalê desmalê keçê ka xudana desmalê...

Ewdalo ezo, werne wê xweştemaşeyê! roja ronî, pêş çavên dehan kesan, "Mihemed Nasir Seqayiyê Bî riya", qutabiyê Mihemed Teqî Misbahê Yezdî, li zarê Misbahê Yezdî, Misbahê Yezdî li zarê Hesen Nesrulla, Hesen Nesrulla li zarê Fermandeyek Hizbullaya Lubnanê di şerrê 33 rojî yê Îsraîl û Hizbullaya Lubnanê de, bêşermane devê xwe bi qasî cêlekekê vekir û bêhn berda û got:

Fermandeyek Hizbullayê di şerrê 33 rojî de Xêzana pîremelayek xurifî ê rejîmê di xewa xwe de dîtiye û wê jina belengaz desmala xwe hejandiye, û di şeir de hilîkopterek Îsraîlî xistiye erdê!!!

Başe xwe di xewê de melajinê desmal hejandiye, û nizanim çawa di qada şerr de ew hilîkopter ketiye"!

Min jî şeva derbasbûyî xewnek dît ku jinxala min çaroka xwe hejand û hejand û hejand, lê çi hilîkopter xuya nebûn, sibê em rabûn ku çaroka jinxala min ji qirika xalê min aliyaye, ger em negihîştibanê wê tirrrrrên ji xalê min bihata.

Lê çi bikim kes ji feqîran napirse, ger ez jî Hizbullahî bûm, min ew xewna xwe ji kanalên ragihandinê re gotiba, bêguman wê biba behsek ewqas gerim ku ne tenê Azerbaycan hejiyaba, belkî layeke Îranê wêran biba. Xewna min wê rojeva nûçeyên televîzyonên rejîmê ba û têra 18 xutbeyên melayan jî kiriba, û wê bigotiban jinxala Hezretê Niqurçk, çaroka xwe ji qirika Şîmon Pirês Serkomarê Îsraîlê alandiye, û ger tirsa xwedê neba wê ew bikira daaaar.

Vêca ji vê yekê seyr û semertir ewe ku Fîroz Abadî jî di bernameyek televîzyonî de gotibû: Di dema hemen şerrê 33 rojî de, "serbazên Îsraîlê hin mirovên siwarî hespan di şerr de dîtibûn ku tevî wan şerr dikirin û nedihatin kuştin!!!!!

Bêhna wî nehat û zêde kir ku serbazên Hizbullayê bi caran di wî şerrî de Îmam Xamineyî bi çavên xwe dîtine!!!!

Axir golkê felahetê, ger waye, di wî şerrê 33 rojî de hêza erdî a we, serbazên siwarê hespan hebûne û gulleyan ji wan kar nekiriye, û hêza hewayî a we desmala destê serçopî! Biborin desmala destê jinxalê bûye, çima rewşa we wusan bû? Vêca Îsraîl dixwaze êrîşî Îranê bike û bavê we bitevizîne, bo wî şerrî kê wê siwarî hêstirê bibe bo qada şerr, xwedê bizane??!!!



# Rojev



# Kurd Li Sûriya



Mo'itesem Nûranî

Kurdistana Sûriyê yan herêmên kurdakincî yên Sûriyê ji hêla giringî û pêgeha stratejîkî a xwe ve, dikewe Bakurê Rojhilata Sûriyayê û li sê parêzgehên Heseke (Cizîr), Reqe û Helebê pêk tê ku beşa herî zaf dikewe herêma Mizopotamiya'yê, anku navbera du rûbarên mezin ên Dîcle û Firatê. Serbarê wê ku Rejîma Beis ji aliyê avedankirinê ve tu giringiyek bi Rojavayê Kurdistanê nedaye, belkî başek berçav ji kurdên wê jî veguhastine û haşayê ji bûna kurdan dike. Herêmên kurdî ji aliyê jêrxana abûrî ve, bi av, petrol û çavkaniyên binerd û herweha geştiyarî, cotyarî û ajeldariyê ve ji hemû deverên Sûriyê dewlemendtir e. Bi tenê li Parêzgeha Hesekê de, çavkaniya petrolê heye ku di rojê de 375 hezar bermîlên petrolê berhem tîne.

Niha bi xweşî be bajarên Heseke, Qamîşlo, Serê kanî, Amûde, Dêrik, Kobanî, Efrîn û gelek bajarên din ku piraniya akinciyên wan kurdin bi destê kurdan tên îdarekirin. Kurd %15 a heşîmeta Sûriyê pêk tînin. Kurd bi salane ji aliyê hikûmeta Beis ve ji mafên xwe ên netewî hatine bêparkirin û pitir ji 500 hezar kurd di wî welatî de xwedî nasname nînin û mafê kirîn û firotina erd û awahî û ... nebûne û ji hemû hewcehiyên jiyanê û xedematên dermanî, saxlemî û nemaze mafê wergirtina pasportê jî bêpar bûne.

Kurdan mafê xwendina bi zimanê xwe yê dayikî nînin. Mafê derxistina rojname û kovar û ragihandinên din bi zimanê kurdî nînin, li tewahiya herêmên kurd akincî de zanîngehek nine.

Dewleta Sûriye ber bi herifîne ve diçe û gelek bi zehmet dikare carek din weke rejîmek bihêz û di bin deshilatek nawendî de xwe bigire. Çûnkî şerê navxweyî niha jêrxana abûriya welat wêran kiriyê û rejîm pir lawaz bûye.

Kurdên Sûriyê beşek ji mezintirîn grûpa netewî ên bêdewlet in ku derfetek baş bi wan re hatiye pêş bo avakirina sîstemek xwebirêvebriyê li jêr her navek guncaw de pêka rewşa îroyîn a Sûriyê. Kurdên Sûriyayê hewil didin ku qewareyek siyasî ava bikin, çûnkî hesta netewî ya kurdan bi taybetî başûr û Bakûr handerê wan e, lê asteng û pirsgirêka ser riya wan, pêdagiriya dewleta Turk e li hember avakirina dewleta Kurdî li Sûriyê de. Ji hêla din ve jî kêşe û pirsgirêkên navbera Kurdên rojava bi xwe de ye. Lê divê tewahiya rêxistin û aliyên siyasî ên kurd weke Encûmena Niştîmanî a Kurd û Encûmena Gel a Kurdî li Sûriyê de berjewendiyên gelê kurd pitir berçav bigirin heya kêşeyên navxweyî serî hil nedin.

Her çend bi xweşî ve di çend mehên derbasbûyî de birêz Mesûd Barzanî, Serokê Herêma Kurdistanê bi xwe li Bajarê Hewlêrê, tewahiya alî û partiyên siyasî ên kurd li Sûriyê gazî Hewlêrê kirin û daxwaz ji wan kir ku rêzê ji hevdu bigirin û piştewaniyê ji hevdu bikin û bihevre kar bikin ji bo avakirina birêveberiyek navxweyî a hevgirtî û Encûmena Bala ya Kurd ava bikin. Bi xweşî ve heya astek baş piraniya aliyan razî bûn û pêşwazî ji vê pêşniyazê kirin û niha karên îdarî li bajarên kurdî de bi awayek baş birêve diçe.

Herçend turkiye gelek nîgeran e, ji ber ku pêşeroja kurdên Sûriyê bandorê dixe ser şêwazê dewleta dahatî a ku li Sûriyayê de dê bê avakirin. Herweha çarenivîsa kurdên Sûriyê bandor û tesîra xwe ji sînûrên wî welatî derbas dike û di niha de nîşanên vê yekê xwe derdixin holê. Kurdê Sûriyê mifah ji aloziyên navxweyî wergirtine û kar dikin daku herêmek otonomî weke ya birayên xwe li başûrê kurdistanê de ava bikin.

Dewleta Tirk pir nîgeranê PKK'ê ye ku ji sînûrê rojavayê kurdistanê ve bi dijî wan çalakiyên leşkirî encamp bide. Lewma dibe PKK jî hest bi berpirsatiyê bike û tu hêcetekê nede destê Turkiyê ku dexaletê li rojavayê kurdistanê de bikin û dest bixine nava kar û barên kurdan de.

www.arsivakurd.org

# Nûçegihanî, pîşeya herî metirsîdar di Îranê de



Arif Vêlzî

Li ser daxwaza civata sinfiya rojnamevanan û piştewaniya Wezareta ''Ferheng û Îrşad'' a Îslamî di dewleta Xatemî de, roja 17ê Gelawêjê ji aliyê Şêvra Çanda Giştî ve weke roja cîhanî ya nûçegihanan di rojjimêra Îranê de hat nivîsandin da ku bibe rojek bo rêzgirtina ji cangorîtî û fîdakariyên nûçegihanan li cîhanê bi giştî û Îranê bi taybetî de. Munasibeta roja han hevdem e li gel kuştina Mehmûd Sarimî, nûçegihanê ajansa fermî a Komara Îslamî (Îrna) ku li bajarê Mezar Şerîf a Efxanistanê ji aliyê çekdarên Talîban ve hat kuştin.

Diyarî kirina rojek han bo nûçegihanan, nîşan ji pîroziya vê rêzgirtina ji pîşekarên wê ye û erkê sereke yê wan rewşengerî hişyar kirin û dana zaniyariyên rast û durust bi xelkê ye, lê mixabin, ew yeka di Komara Îslamî de wateyek tune û her tişt bi sansorê re beber birû dibe.Çûnku midehek zaf bi ser destnîşankirina roja nûçegihan re derbas nebibû ku di Banemera sala 1379'an de, li ser biryara rêberê Komara Îslamî û ji aliyê Qazî Murtezewî ve, pêla yekem a daxistina ragehandinan li Îranê dest pêkir û gelek rojnamevan û nûçegihanan hatin binçavkirin, îşkencedan û zîndanîkirin.



Rewşa aloz û nebûna ewle hi ya canî û karî ya nûçegihan berdewam kir heya ku di 22'ê Cozerdana sala 1388'an de, piştî kûdetaya hilbijartinên serkomariya Îranê, pêla duyem û xurt a serkuta rojnamevan û nûçegihanan tewahiya welat xist bin bandora xwe û di encam de rojnamevanekê canê xwe ji dest da û bi dehan kes jî ketin girtîgehên Komara Îslamî û bi awayên hovane hatin îşkencekirin û hinek jî, ji tirsa deshilata kevneparêza Melayan ber bi welatên din rewiyan û bûn penaber.Di demekê de em roja nûçegihanan di Îranê de derbas dikin ku mixabin ragehandin bi giştî û nûçegihanên xwedî wîjdan û bi pirnsîp di gel yasa û rêsayên nûçegihaniyê û herweha pak digel xelkê xwe di Îranê de, di rewşek pir xirab û metirsîdar de ne û tirsa gazikirin, gefxwarin, girtin, serkut û sansorê hemû jiyana wan xistiye bin bandora xwe. Lê di hember de jî, binav nûçegihanên ku ser bi sîstema siyasaî ya melayan in û rastî û dirustiyên jiyana rojê çewaşe û berxwar dikin û çavên xwe li hember zulm û stema hikûmeta Tehranê dimiqînin, di rweşek pir baş dene, çima? Çûnkî li hember hêla sor ya diyarîkirî ji aliyê deshilatê vê bêdeng disekinin û di cihê wê ku şirove û analîza pirs û babetên rojê bikin, pitir ji metoda pesn û mehtakirinê mifahê werdigirin.

Karê pir metirsî lê pîroz a nûçegihaniyê li Îranê de bi awayekê hatiye çewaşekirin ku berevajî hemû cîhanê nabe tu basekê ji hikûmet, dewlet, Parlemênt, hilbijartin, dîplomasî, siyaseta derwe û hundur, kêmasiyan û gelek babetên din yên pêdvî û peywendîdar bi jiyana xelkê ve bikin û wan ji karê eslî ku rastbêjî û vedîtin û eşkere kirina rastiyan e, dûr dikin

Niha pirsyar ev e ku hekî rewş bi vî awayî be, nûçegihan û rojnamevan dikarin bas ji çi bikin? Çawa karê xwe bidomînin di demekê de ku, serbarê qedexe bûna tewahiya pirs û babetên siyasî ku me bas jê kirin, babetên weke abûriya welat, pirsên netewî, olî, giranî, helawsan, werzîş, nirxa mirîşk û nemaze avrêşkanê ya ciwanan di parkan de jî, bi pirsên siyasî tên hesibandin û diçin nava cixiza hêla sor de û cezayên tund bi dû xwe re tîne?

Bi vî awayî tê xuyakirin ku li sê dehsalên derbasbûyî de. Îran bûye zîndanek bi bo rojnamevanan û nûçegihanên azad. Bi taybetî dewrana herî xurt a serkut û sansorê li dijî rojnamevan û di Îranê de, vedigere bo van sê salên dawîn, an ku piştî hilbijartina sala 1388'ê ku têde hêzên ewlehî yên Komara Îslamî bi awayek berfireh dest avêtin desteserkirina wan bi tometên cur bi cur weke bêrêzîkirin bi rêber û serkomarê welat, hewildan li dijî nizamê, sîxorî û peywendî bi medyayên derve weke BBC, peywendî bi rêxistin û aliyên siyasî ên opozisyon û... hwd . Lê di rastî de tawana wan, bi tenê eşkerekirina beşek ji rastiyan û rexne girtin ji siyasetên şaş ên karbidestên Komara Îslamî û ne berpirsatiya wan di hember xelkê û birêvebirina welat de ye.

Lewma di pilebendiya nû a cîhanî di warê azadiya ragehandinê de, ku hemû salekê ji aliyê nûçegehanên bê sinûr ve tê weşandin, rewşa azadiya ragehandinê di Îranê de dikewe dawiya rêzbendê û di tewahiya cîhanê de, Îran bi tenê li çar welatên Sûriye, Turkemenistan, Koreya Bakûr û Erîtirê baştir e, çûnkî pitir ji 50 nûçegihan û rojnamevan û wêblagnivîs di girtîgehên Komara Îslamî de hatine hebskirin.

# Madeyên Efyûnê li Îranê



Eskender Ceiferî

Dema ku mirov rûpelên malperan vedide ji ber nûçeyên nexweş û tal û datayên li dor madeyên bêhisker jorde çûna hejmara bengdaran xembar û mendehoş dibe. Bi taybetî li Îranê de ku rewşek pir xirab û aloztir li vê derheqê de heye. Rewşek ku mîna ewrên reş û tarî hemû asîmanê Îranê dagirtiye û li nav her tex û qetek civakê de xwe dide xuyandin.


Rewşek ku berhema siyasetên pilankirî ên rejîma Komara Îslamî a Îranê li dijî xelkê bê berevane Îranê ye. Bi taybetî her mirov mêzeyî herêm û deverên etnîkên cuda ji hakimiytê bike wê demê derdikewe ku rejîm çi pilan û lîstekên hovane li dijî wan netewan birêve dibe. Kurdistan jî yek ji wan e. Eva jî xêneî wê ku bikarhîner bin, belkî berhemhner in jî. Niha li gelek deveran de ew made bûne berhemên kiştûkalî ên cotyaran. Bo nimûne li herêma Urmiyê, gelek caran ji aliyê xelke ve ev made weke berhemek kiştukalî hatiye çandin û rakirin, lê di heman demê de desthilat ji wan kesan re ku ji dewlet re xizmetê dikin, çi nabêje û dihêle ji xwe mijûlî karê çandina wê madeyê bin. Li gelek herêman jî bi awayakê dêmî heye û hin çavkanî didin xuyakirin ku tovê wê madeyê ji aliyê dewletê ve hatiye dabeşkirin da ku heta şivan,gavan û bêrî yên kurd, jî van bi kar bînin û tûşî wê madeyê bibin.

Ji alî din ve li gelek şûnên bajarê Urmiyê weke Îslam Abad û Kuştargayê de bi awayek berfireh ev made bi dest dikeve û Hêzên Ewlehî jî pêşiya kirryar û firoşyarên madeyên hişber nagirin. Gelek caran Hêzên Ewlehî dikevin kûçe û kolanên Kuştargayê û piştî hilkulîn û girtina wan, dîsan wana vedigerînin ser cihê xwe. Eva jî tê wateya ku Hêzên Ewlehî wan kesan weke kirêgirtî û meimûrê xwe bona bengdar kirina xelkê ji aliyekê û sîxorîkirina bo wan hêla din ve bikar tînin. Her wîsa gelek caran ji aliyê wan hêzan ve jî firoşyarên mewadan re hatiye gotin ku hekî hûn harîkariya me nekin, em nahêlin ku hûn wî karî bikin û hûnê bên ceza kirin.

Her wiha li hin şûnên dewletî weke "Merkezê Terkê Itiyad" a ser bi Zanîngeha Ulûm Pizişkiya Urmiyê, ew mewad bi awayekê eşkere tê kirîn û firotin, lê kesek tune ku pêşiya wan firoşyaran bigire. Pêka çavkaniyên haydar, li ber deriyê wê Merkezê, madeyên bêhişker bi awayek eşkere tên firotin û her li ber deriyê wê nawendê jî tên bikaranîn. Vir de durûtiya rejîmê û siyasetên dijî gelî ên wan ji xelkê re eşkere dibin. Ji ber ku çawa dibe ji aliyekî ve Hikûmet hewil bide da ku xelk tûşî wê madeyê nebe û ji rexê din ve jî pêşiya wan firoşyaran negire?

Ji aliyek din ve em dibînin ku navendên 'Terkê Êtiyad'' ji aliyê hêzên Ewlehî ve tên daxistin. Anku ''Emakin'' îzna xebatê bi wana nade û ger jêre jî dabe,dîsan jê distîne. Lewma cihê pirsiyarê ye ku çawan dibe cihek ku ne cihê karê siyasî û çandî ye û tenê hewlê ji bo rizgarkirina civakê ji madeyên hişbere, dide, dibe werin daxistin? Ewa jî di demekê de bû ku tu bûdceyek hikûmetî ji bo alîkariyê bi wan nawendan nahê dayîn û ew nawend li ser hesabên xwe vî karî dikin. Her weha gelek caran em dibîsin yan dibînin ku hêzên rejîmê barên girtî dişevitînin û jinav dibin, lê eva senaryoyek din a rejîmê ye û pişkeke kêm ji wê mewadê li ber çavên Televîzyon û ragihandinan ji nav dibe û diherrimîne, lê beşa zaf ji wê mewadê dimîne û Hikûmet bazerganiyê pê dike û li nav xelkê de bilav dike. Gelek caran li Urmiyê hatiye zanîn ku barê mewadê ê kesekê bi qasî çend hezar kîloyan dest bi ser de hatiye girtin. Lê piştî çend rojan li deng û rengê herêmî a Komara Îslamiya Îranê de belav dibe ku barek qaçax a mewadê bi qasî 100 kîloyan hat girtin û piştre hat şevitandin. Lê beşa din ya mayî çi jê tê?

Bi wî awayî derkikeve ku mafyaya herî mezin li Îranê, rejîm û hêza tepeserkar a wê, anku sipaha Pasdaran e û ji vî karî hem qazancek baş ya abûrî dikeve destê wan, hem jî meramên xwe ên siyasî pêşev dibin û li vê navberê de yê ku metirsiya nemanê gefê ji wan dixwe, tenê xalkê bêberevane Îranê û bi taybey yên Kurdistanê ne ku dibe ji vê xewa şirîn hişyar bin û êdî nebin lîstika destê rejîmê.




www.arsivakurdi.org

Hevpeyvîn: Bêhzad Simko

**Mam Ehmed:**

## Dr. Qasimlo kerem kir, çiqas hûn bikarin xwe ji wan şeran dûr bigirin, herweha bi belavokan û roşengeriyê pirsgirêka eşîretan kêm û çareser bikin.



Navê min Ehmed e, lê li nav xizm û kesan de bi Ehmê li nav hizbê de jî bi mam Ehmed têm naskirin. Sala 1334'ê li gundê Yêrelmax a ser bi bajarê Makû'yê li malbetekî hejar û kurdperwer de ji dayîk bûme. Babê min midehê 10 salan li zîndana Şahê Îran de hepsî bû û berî şoreşa gelên Îranê hat serbest berdan.

Ji ber wê ku jiyana xelkê pir dijwar bû û xelik pirr feqîr û destkurt bû, gavanî û şivanî karê zorahiya xelkê bû; xwendewarî pirr kêm bû, dema zarokatiya me, qutabxane li gund tunebûn. Piştî ku em mezin jî bûn êdî dereng bibû û me nekarî bixwînin.

Sala 1357'an a rojî, meqer û komîteya PDK Îranê li Makûyê bi hevkariya hin kesên navdar û xwedî desthilat bi taybetî nûnerê Makûyê (Şehîd Hesen Wekaletî) hat damezirandin . Serok eşîr, û rûsipiyên gunda dihatin wir û digotin eva komîta kurdan e. Ez jî têde bûm endam û min dest avête kar û çalakiyan. Me (ez û kurmamek xwe ''Hesen''û Hesen Wekaletî) meqerk li nav gundê Axgolê û yekî din jî li nav Saka da ava kir.
Ez bi wan re du caran çûme Mehabadê bal Şehîd Dr. Qasimlo.

Sala 1358'an de ji ber şerê sepandî bi ser gelê kurd de, li navbera me û hêzên rejîmê de şer û pevçûn çê dibûn. Ji aliyê dine jî di wê demê de şerên eşîretî li navbera Celaliyên Makû'yê de dest pê kiribû ku çend kes hatibûn kuştin. Dr. Qasimlo kerem kir: Çiqas hûn bikarin xwe ji wan şeran dûr bigirin, herweha bi belavokan û reşengeriyê pirsgirêka eşîretan kêm û çareser bikin. Xelkê bicivînin û li meqeran de wan kom bikin, tevî wan qise bikin, endamgîriyê bikin û daxwaza hevkariyê ji wan bikin.

> ***Şanaziya herî mezin bo min ew e ku min du caran şehîd Dr. Qasimlo dît. Her du caran jî li Mehabadê, carekê jî me destê hev girt***

Sala 1359' ez bi fermî bûm pêşmerge û me çend operasiyon encamdan, lê zêde me dixwest ku karê teblîxatî bikin û bi taybetî şehîd Hesen digot: ''Bila tu kes neyê kuştin''.

Paşan şehîd Hesen, bi pilan û senaryoyek darêtî ya rejîmê li jêr navê navincîtî û çareser kirina kêşe û şerê malbatî ê li navbera kurmamên wî de bo wir hat rakişandin û mixabin bi nemerdî ew şehîd kirin.Piştre li sala 1360'î de mela Hesen Şîweselî, Celîl Gadanî û sergurd Rebî'î weke meimûriyet nêzîkî 4 mehan bo herêma Makû'yê hatin şandin û xebat û çalakiyên çekdarî û siyasî yên cur bi cur bi serbilindî ve bicî anîn.

Li 14'e Sermaweza heman salê de, Komara Îslamî êrîşek berfireh kire ser me û gundê me kawil û şevitandin, nemaze mizgevta gund jî şevitandin. Em hilkişiyane quntara çiyayê Agirî li nav eşîretên Qizilbaş û Sakan de. Ew ji zarok û gundiyên me heta bihara sala din xwedî derketin û pêwîstiyen wan jî dabîn kirin. Paşan rejîma Komara Îslamî li buhara sala 61'an de efûyek giştî bo wan gundiyan ragihand û ew vegeriyan cihê xwe.

Her çend ku hin jî wan derbasî Turkiyê bibûn ku yek ji wan, apê min bû bi malabat xwe re. Ew midehê şeş mehan li wir mabûn, lê piştî vê bi zorî radestî dewleta Îranê kirin û rejîmê ew li Makû'yê de hepsî kirin, lê xelkê Makû'yê û bi taybetî Azeriyan nerazîbûna xwe li pêşberî fermandariya Makû'yê li hember zîndanîkirina jin û zarokan nîşan dan û rejîm neçar ma ku piştî 24 demjimêran wan serbest berde.

Ji ber wehşet û zext û givaşên rejîmê, hêdî hêdî hêza me li vir kêm dibû, bi neçarî em bo Herêma Somayê paşde kişiyan. Li wir şehîd Guro, kurê Emerxanê Şikak hat pêşwaziya me û kêmasiyên me dabîn kirin û em gihandin gundê Heştiyanê.

Midehek şûndatir herêma Soma û Biradostê ket destê dujmin û me tu rê neman. Lê Tahirxanê kurê Simko hevkariya me kir û em di gundê Coniyê de veşartin ta ku me rê peyda kir û hêzên me hêdî hêdî kom dibûn. Em bûn 50 pêşmerge, çek û silahên me bi destê Esker, kurê Tahirxan dabîn bibûn.


Hey Donya! Ewqas sal çawa bilez derbas bûn, dem derbas dibe û temenê me ber bi dawiyê dice. Me jî rojên sext û dijwar, xweş û nexweş, şirîn û tal derbas kirin. Çiqas bîrewerî ji me re man. Lê naxwazim xwendevanên we bêpar bihêlim ji wan. Midehek bû xelkê gazinde ji kesekê dikirin bi navê Sofî, ku bi gotina xelkê caş bû.

Lê wî hin caran hat û çoya nav me jî dikir û em pê nehesiyabûn. Ez hatim şandin bo kuntirol kirina wî. Rojekê li nav seyrangahekê da min ew dît bi çend kesan re. min baş şopand, dûre min fêm kir ku ew pasdar in û bûye kirêgirtiyê rejîmê. Piştî wê destûra girtina wî bal pêşmergan ve hat dayîn.

> ***heta ez hebim, dê rêbaza Dr.Qasimlo, Dr.Seîd û şehîdan bidomînim***

Heval çûn û ew girtin. Birêz mela Hesen Şîweselî û Clîl Gadanî di nava şikevtê de pêre qise dikirin û kar û tawanên wî jêre dihejmartin, lê Sofî berdewam înkar dikir ku tu têkiliyek bi rejîmê re hebe.

Paşan neçar ma ku îtiraf bi sîxortiya xwe bike, lewre kete girî, lahî û dalahiyan û daxwaza efûyê kir. Biryar hat dayîn ku Sofî were serbest kirin çûnku poşman bûye. Me Sofiyê xwe bire ser cadê û ew berda. Li ber çavên me siwarî tirombêlekê bû. Li xeyala xwe de me Sofî ji rejîmê qedandiye û ger nebe welatparêz jî, êdî îxanetê nake!. Lê hêj em 5 deqîqeyan li ser cadê dûr neketibûn ku Sofiyê pilegewir hêza caş û pasdaran bi alîkariya hêlîkopteran anî ser me û bi zehmet û dijwarî me karî xwe xilas bikin.



Şanaziya herî mezin bo min ew e ku min du caran şehîd Dr. Qasimlo dît. Her du caran jî li Mehabadê, carekê jî me destê hev girt. Niha pêş çavê min e.Mixabin min tu car Şehîd Dr. Seîd Şerefkendî nedît. Min du caran jî sergurd Ebbasî dît ku bîreweriyên xweş in bo min û tu car ji bîr nakim.
Jiyana pêşmergatiyê tejî ye ji bîreweriyên xweş û tall ku ger bibêjim vê hilgirê gelek nivîs û pirtûkan be, lewma bila serê xwendevanan neêşe û dixwazim bibêjim hewce ye pêşmergên nû, pitir guhdariya wan ceribîn û ezmûnan bikin û ji xwe re bikin ders.

Bila agedarê halê pêşmergên kevnar bibin û zortir li ser bîranînên wan bixebitin. Bila çepera berxwedan û şeref a pêşmergatiyê tu car vala nehêlin.
Herweha li dawiyê de dixwazim bibêjim ku: heta ez hebim rêbaza Dr.Qasimlo, Dr.Seîd û hemû şehîdan wê her bidomînim.

www.arsivakurdi.org

# Bajarê Tikab



Mecîd Cinîkanlû



Şaristana Tikabê, yek ji bajarên girîng û stratejîk yên Rojhilata Kurdistanê ye.Tikab li başûrê rojhilata parêzgeha Ûrmiyê cî girtiye û xwedî dîrok û çandekî taybetî û balkêş e.

Şaristana Tikabê li rojava li gel şaristana Şahîndijê û li bakûrê rojhilat li gel Parêzgeha Zencanê û li başûr jî li gel şaristana Seqiz a ser bi Parêzgeha Sine ve hevsînor e. Şaristana han li gel sê parêzgehên Azerbaycan, Sine û Zencanê cîran e.

Rûberê Şaristana han, 5,880,000 metroyên çargoşe ye. Tikab xwediyê 102 gund û herêmekê bi navê "Text Silêman"e û tenê rûbarekî pirr av yê herêmê heye ku navê wê Saro ye ku ji ava han ji bo vexwarina xelkê bajar mifah jê tê standin.

Nifûsa şaristana Tikabê li gor serjimêriya sala 1385'an a Rojî 81395 kes e.

Piraniya xelkê devera Tikabê Kurd in. Lê li herêma han hin malbatên Azeriyan jî dijîn ku bi derbazbûna demê li wir akincî bûne. Kurdên herêmê Kurmanc, Soran û Kelhûr in ku dîroka akincîbûna wan ji bo serdemên gelek kevin vedigere. Kurmancên herêmê piranî Zaxoranî, Mûsilanî û Çerdawrû ne ku li serdemên gelek kevin û ji ber şer û zordariyên împeratorîyên zal bi ser Îranê li wê herêmê de hatine akincî kirin.

Her wusa li nava Kurdên wir de hin ji wan ku bi goran hatine naskirin, ehlîheq in ku olekî gelek kevin yê Kurd in ku Îro rojê li herêmên Kirmaşan û Îlamê de hene. Kurdên herêma Tikab û Sayîndêj û Miyanduavê navê herêma xwe bi hevşar yan hevt Şar bi nav kirine.

Kurdên herêma Tikab û Sayîndêj û Miyanduavê navê herêma xwe bi hevşar yan hevt Şar bi nav kirine.

Danîna wî navî li ser wan herêman ji bo dîrokek gelek kevin û bi gotina hin ji dîroknasan ji bo serdemê Sasaniyan vedigere ku li vê herêmê 7 bajarên mezin li cem hev bûne lê bi derbaz bûna çax, zaf ji wan bajaran jinav çûne û hin ji wan jî mane. Ew gotina han ji aliyê gelek ji dîroknivîsan ve hatiye piştrast kirin.

Her wusa hin kes jî dibêjin ku Hevşar bi wateya êla Efşar tê û Nadir Şahê Efşar li wê herêmê ji dayîk bûye. Efşar êlekî bi esil Kurd in ku zêdetir li bakûrê Kurdistanê jiyanê dikin, lê yên ku derbazî Îranê bûne piranî bûne Tirk û xwe bi Tirk didin nasîn.

Li herêma Tikab û derdora wî bajarî gelek şûnwarên kevin ku dîroka wan hemû bo Kurdistanî bûna vê herêmê vedigere hene. Textê Silêman ku yek ji cihên herî kevnar yê Rojhilata navîne, li vê herêma Kurdistanê de hilketî ye.

Text Silêman ku cihê Agirgeha bi nav û deng ya şahên Sasanî ye û dîroka wê ji bo pitir ji 3500 salan vedigere û li zaf pirtûk û çavkaniyên dîrokî navê wê hatiye. Agirgeha Azergeşseb wek 4'mîn şûnwarê kevin yê Îranê li Yûnisko'yê hatiye tomar kirin.

Dîroka eşkere ya vê Agirgehê, bo pitir ji 3500 salan berî zayînê vedigere. Ev Agirgeha pîroz, xwedî gelek belge li dîroka Kurdan e. Li cem vê Agirgehê bi sedan asewarên din hene ku bo mînak em dikarin îşare bi: Çiyayê Zîndan a Silêman, Kela Bilqêys, Kela Sarî Qûrxan, Çar Sitûn û Zîndana Birince bikin.

Tikab li serdemê Sasaniyan de gelek girîngî hebûye û şahên Sasanî hemû salê ji bo ziyareta Agirgehê diçûne vê herêmê û her seba vê yekê Tikab xwedî girîngiyek zaf bûye û şahên Sasanî li avedaniya wî bajarî de gelek kar kirine.

Li rastî de Agirgeha Azergeşşib wek hêmaya hevgirtin û sembola hêza dewlata Sasanî û Zerdeştiyan bûye. Tê gotin ku agirê Agirgehê pitir ji 800 salan her hilbûye û Mûxên Zerdeştiyan li wir xwedî qedir û qîmetek zaf bûne. piştî dagîrkirina Îranê ji aliyê Ereban hêdî hêdî ew rûmeta xwe ji dest da û wek cihekî kafiran dihat mêze kirin.

Li serdemê Qacaran ev herêm wek herêmekî gelek girîng ji bo Kurdan dihat hesibandin û piştî serhildana Şêx Ubeydula Nehrî û êrîşa wî ya li ser Îranê Kurdên Tikabê li refa şervanên wî de cih girtin û li êrîşa ji bo ser bajarê Meraxê de rolekî taybtî hebûn.
Her çend ku şervanên Şêx tenê heya nêzîkî bajarê Meraxê çûn.

***Text Silêman ku cihê Agirgeha bi nav û deng ya şahên Sasanî ye û dîroka wê ji bo pitir ji 3500 salan vedigere û li zaf pirtûk û çavkaniyên dîrokî navê wê hatiye û Agirgeha Azergeşseb wek 4'mîn şûnwarê kevin yê Îranê li Yûnisko'yê de hatiye tomarkirin***

Niha jî li derveyî bajarê Meraxê cihek heye ku wek hêmaya Şêxê Neherî bi cih maye û nîşanderê wî serdemê zêrîn e.

Li serdemê Serhildana Simkoyê Şikak de, êlên herêma Tikabê gelek cangorîtî li refa şervanên Simko de kirine û bi awayekî gelek xurt dest bi xebat ji bo rizgariya xaka bab û kalan kirin.

Li piraniya şerên herêmê de Kurdên Tikabê beşdariyekî bi bandor hebûn û li şerê Bajarê Miyanduavê de bi camêriya xwe leşkerên Îranê têkşikandin.

Kurdên Tikabê û bajarê Tikabê wek yek ji herêmên herî girîng yên Kurdistanê tên hesibandin û bêşik dibe em hewil bidin vê nasnameya Kurdistanî ku îro seba siyasetên mirar yên ku Komara Îslamî a Îranê girtiye ber, li jinavçûnê biparêzin.



www.arsivakurd.org

# Hunermend Bêmal Rajan



Orhan Munezemî

Hunermend Bêmal Bêmdad, naskirî bi Bêmal Rajanî yek ji xwedî Dengên bisoze Kurd bû ku mixabin gelek bas jê nehatiye kirin. Bêmal li sala 1315'an a rojî li gundê Zîndeşt a Selmasê li Malbatek destkurt ji Dayîk dibe. Bêmal serpêhatiyek dûr û dirêj heye, nemaze navdanîna wî jî bi helkewt nebûye û serpêhatiya xwe heye. Navê Babê Bêmal, Îbrahîm û diya wî jî Besê bûye. Bêmal di zikê dayîka xwe de bûye ku bavê wî diçe ber dilovaniya Xwedê. Axayê wî serdemî ê gund ji ber wê ku Îbrahîm xwediyê zarokek mezin nebûye, mal û milkê wî zewt dike û dide mirovên derdora xwe.


Dema ku Besê ji Erbab re dibêje ez bi heml im û renge ez bibim xwediyê xortekê. Erbab jêre dibêje hekî te kur anî, şert be şertê mêran ez hemû milkê we vegerînim. Lê dema ku zarokê Besê tê dinê, Erbab mêraniya xwe nagehîne cih û milkê wan nade wan. Ew dibe sedem ku Besê navê kurê xwe bike Bêmal.

Diya wî piştî demekê tevî pismamek Bêmal dizewice û bi yekcarî Zîndeştê bi cih dihêlin û diçin gundê Rajan a ser bi devera Mirgewer a Urmiyê. Bêmal li Rajanê mezin dibe û di bihara sala 1342'an de dizewice û berhema wê zewacê dibe 7 zarok.

Li zivistana sala 1365' a rojî de Gulnaz a hevjîna wî koça dawiyê dike û Bêmal dimîne û 7 zarokên Xwe. Dijwariyên jiyanê Bêmal ber bi karên giran û dijwar pal didin. Bi taybetî bo peydakirina bijîva jiyana xwe û zarokên xwe, bi neçarî dest davêje jiyana kolberiyê.

Di gerrek xwe de bo sînor û karê kolberiyê li zivistana sala 1366'an de li gundê Şikeftan a Kurdistana Bakûr seba hatina reniyê ji hevalan vediqete û jiyana xwe ji dest dide. Paşî çend rojan xelkê gund vedigerin cihê bûyerê û bi zehmet dikarin termê bêcane wî peyda bikin û Bêmal tînine gundê Rajanê li tenişt tirbê hevjîna wî defin dikin.

Bêmal gelek demên dirêj, ji boy çand û mosîqaya Kurdî xebat kir. Xebata hunerî a wî, stranên dîwanî yên Kurdî bû. Stranên ku dîroka me vedigerandin



. Dîroka bav û Kalên me û kul û keserên wan distirand û bi vê yekê jî him ziman û him jî çanda kurdî diparast.

Dengê bisoz û lorînên ji dil ên Bêmal bo welat, kezeba mirov dişewitand. Wî li gelek meclîs û rûniştinan de bo xelkê deverê diaxivî û digot hûn nabe bi hev re dujmin bin. Şerrên nav malbat û hoz û eşîran de, netewa me dikuje.

Wî berdewam basa wê hindê dikir ku dibe em ferhenga xwe biparêzin, vêca çi bi stranan be, çi bi kinc û cil û berg û ziman be. Erka ser milên me ew e ku xwedî ji fulkulora gelê xwe derkevin û biparêzin. Bila zarokên xwe bi çanda Kurdî mezin bikin û bi wêje û mosîqa û çanda xwe mezin bikin. Bila keç û xortên Kurdan serî bo çanda biyaniyan netewînin.

Her çend ku jiyana hunermendên wekî Bêmal Rajanî hilgirê gelek nivîs û lêkolînan e dibe nifş û ciwanên me bi haydar bûn û nasîn jiyan û xebata wan, deyna wan li ser xwe hildin.

# Pirtûka Dr. Qasimlo "Kurdistan û Kurd" bi kurmancî derket


**Şehîd Qasimlo bi hûrgilî li ser rewşa aborî û siyasî ya her parçeyekî Kurdistanê rawestiyaye û daneyên balkêş pêş me kirine. Dema ku mirov berhemê dixwîne, ji ber hînbûna tiştên gelekî balkêş û girîng kelecan li mirov radibe.**

Di çarçoveya xebatên Weşanxaneya Lîsê li Amedê de, dor giha pirtûka lêkolînî a siyasî û aborî ya Dr. Qasimlo bi navê "Kurdistan û Kurd. Ku karê wergeran û lêanîna wê ji soranî ve bo kurmancî, ji aliyê nivîskar Ziya Avci ve hatiye encamdan.

"Kurdistan û Kurd" heştemîn pirtûka Lîsê ya rêza bi navê Lêkolînên Kurdewarî, li ser rewşa Kurdan a siyasî û aboriya Kurdistanê ya beriya sala 1965'an e, ku di vî warî de çavkaniyeke serekî ye.

Tê zanîn ku pirtûk cara pêşîn bi Çekî hatiye nivîsîn, lê çapa wê ya yekemîn bi Slovakî di sala 1964'an de derçûye.

Paşê li Pragê û li Londonê du çapên pirtûkê yên bi Îngilîzî derçûne. Çapa pirtûkê ya bi 'Erebî cara pêşîn ji ber çapa wê ya bi Îngilîzî derketiye. Bi dû re, pirtûk di sal û deverên cuda de bi gelek zimanên din çap bûye.




Navdartirîn û girîngtirîn berhema Dr. 'Ebdurrehman Qasimlo, ku têza wî ya doktorayê ye jî, pirtûka Kurdistan û Kurd *e.* Lêkolînên wî, şêweyê akademîk û zanistî li xwe digre û ji ber wê, berhemek dewlemend û kêmwêne û çavkaniyek pirr baş e.

Ya ku pêwîst e, bila hemû xwendevanên Kurd ên baldar û lêkolînerên Kurd tevî pirtûkxaneya xwe bikin.

**Rojeva kurd**

## Kaniya helbestan



## Tîrêjên Gelawêjê

Gelawêjek çuwarçirayê,
şewqa xwe da hawîrdor

Tîrêjên wê gelawêjê, pirr
ronî bûn keskesor

Esmanê şîn û bilind bû wek
ramanên me ên kûr

Banga Pêşewa bilind kir bo
saxlemiya wijdan

Şêne rihanek ji bejna
Qasimlo çand bo herman

Kehkişanek bêdawî bû weke
meşa pêşmergan

Zengilek bo revandina
xewa gelên bêxwedan

Rihek da ber cesedê
nesaxe çiya û deştan

Mîna baraneke zelal
bişkivand pişkoja hizran

Sûyebayê hêviyan hilkire
ser toza banan

Bû şulxeyek bo civatên
mêrxas û xanên xanan

Gelawêj e agirê geş
diçilvile ser çiyan

Gelawêj e, xeml û rewşe,

Tîrêjên rojê hilan

N:Ceifer Mubeşirniya

www.arsivakurdi.org

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com





## Daxuyaniya Deftera Siyasî a PDK Îranê bi boneya bûyera erdhejê li parêzgeha Azerbaycana Rojhilat



Mixabin demjimêr 5:05'ê êvariya roja Şemî, 11'ê Tebaxa 2012'an, erdhejek bi pileya 6.2 rîşter li deverên Azerbaycana Rojhilat bi taybetî bajarên Eher, Herîs, Werziqan û Kelîber û herweha gundên ser bi wan bajaran hejand û xesarên canî û wêraniyek zêde ji xwe bicih hêşt.

Li gor nûçeyan, heya niha di wê bûyera sirûştî de pêtirî 250 kesan canê xwe ji dest dane û nêzîk bi 2 hezar kesî jî birîndar bûne, 12 gund bi tewayî jinav çûne û nêzîk bi 100 gundî jî tûşî xesarê bûne.

Li gorî zanyariyan demjimêr 4:50 xulekan jî erdhejek din parêzgeha Urmiye, Gîlan, Zencan û Erdebîlê hejand ku xesarên ji wan deveran nehatiye ragihandin.

Deftera Siyasî a PDK Îranê tevî dilêşiya xwe ji wê bûyera xwezayî û can jidestdana hejmarek hemwelatiyên me, sersaxiyê dide malbatên goriyên bûyerê û hevxemiya xwe bi wan re nîşan dide, û hêviya başbûna her çiqas zûtir ji birîndaran re dixwaze.

Di vê pêwendiyê de em bi erkê hemû aliyekê dizanin ku bi hawara xesardîtiyan de herin û di vê rewşa nexweş de alîkar û piştevanê wan bin.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**12'ê Tebaxa 2012'an**

## Kê van rondikan bi stû digre?

Dîmenên erdheja Azerbaycana Rojhilat li Îranê wijdana mirov dihejînin. Dîmenên termên bêcane zarokan li bin kawilk û dîwaran, lorîna dayîkên cergsotî, hawar û nalîna birîndaran, banga alîkariyan û çavnihêriya lêqewmayiyan, gorîzankan dixe bedena mirov û mirov matmayî dihêle.

Niha piştî derbasbûna çend rojan bi ser erdheja han de, hêj xelkê lêqewmayî çavnihêrê alîkariyan in û ji bê îmkanatî û xemsariya berpirsan bihêrs in.

Ji ber ku berpirsên rejîmê li destpêkê de bi derengî bi hawara lêqewmayiyan de çûn. Piştre li asta ragihandina xwe de, rejîmê girîngiyek wusa pê neda. Nemaze ragihandin û medyayên biyanî zûtir û zêdetir bal kişandin ser rewşa xelkê lêqewmayî.

Herweha serbarê wê ku bi xwe xemsar bû li gihandina hewcehiyan û tîmên hawardeçûnê bo derxistina xelkê li bin kawilk û xirabeyan de dereng şandin, herweha xwe ji wergirtina alîkariyên derve jî parast. Piştî qebûlkirina wan alîkariyan jî spaha pasdaran dest bi ser wan alîkariyan de girtiye û heta diziya xelkê lêqewmayî û alîkariyên bi wan dikin û nemaze li parvekirinê de jî ferq û cudahiyan dikin.

Niha xelkê lêqewmayî li benda alîkariyan in û metirsiyên li ser jiyana wan hêj berdewam in, ji ber ku kêmiya xizmetguzariyan, nebûna îmkanatên hewce, bêhna kelexan û ... egera tûşbûna bi nesaxiyan zêde dike. Herweha berdewam bûna erdhejên biçûk tirs û xofek mezin xistiye nav dilê xelkê wan deveran.

Lê li cihê gihandina alîkariyan, rejîmê hewil daye ku deverê mîlîtarîze bike û bi ewlehî kirina deverê pêşiya nerazîbûna xelkê bigre.



